Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1356 | 4-Adar-2026 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Firçeya ku bîranînê diparêze

**Hêvî Keleş/ Qamişlo**

**Zêdetirî 18 sal in ku wênesazê Kurd Roder Îbrahîm rêwîtiya xwe ya bi rengan re domandiye, ji folklora Kurdî û nasnameya çandî îlhamê digire, da ku tabloyên xwe veguherîne bîranînek dîtbarî ku mîratê diparêze û bi giyanek zindî û hemdem wê ji nifşan re vediguhezîne.**



Di serdemeke guhertinên çandî yên bilez de, wênesazên ku hunerê wekî amûrek ji bo parastina nasnameyê û parastina bîra kolektîf bikar tînin derdikevin holê. Di nav wan de wênesazek heye ku zêdetirî 18 sal ji bo belgekirina folklora Kurdî jiyan kiriye, hûrguliyên jiyana rojane û sembolên mîratê veguherandiye berhemên hunerî yên zindî û resen, ew jî Roder Îbrahîm e.

Ji destpêka xwe ya herî zû ve, wênesaz fêm kir ku wênesazî ne tenê îfadeyek estetîkî ye, lê peyamek çandî û berpirsiyariyek dîrokî ye. Wî hilbijart ku folklora Kurdî bike navenda karê xwe, îlhama xwe ji hûrguliyên jiyana kevneşopî werdigire, ji cilên gelêrî yên xemilandî bigire heya rêûresmên dawetê û reqsên komê, ku di tabloyên wî de bi awayekî zelal têne nîşandan. Zêdetirî hejdeh salan, hunermend di navbera dibistan û şêwazan de digeriya, lê wî bingeha projeya xwe ya hunerî parast, damezrandina nasnameya Kurdî di tabloyeke hemdem de. Armanca wî ne tenê belgekirina dîmenê wekî xwe bû, lê di heman demê de pêşkêşkirina wê bi vîzyonek hunerî ku aliyekî mirovî yê cîhanî dide wê bû.

**Folklora kurdî…Rengên ku çîrokê vedibêjin**

Folklora Kurdî di nav hêmanên dîtbarî yên herî dewlemend ên herêmê de ye. Karê wênesaz bandora pîrozbahiyên bi nirx ên wekî Newrozê nîşan dide, ku agir di paşxaneya tabloyan de dibiriqe, sembola nûbûn û azadiyê ye. Govendên gelêrî yên Kurdî, bi cilên xwe yên geş, jî cih digirin, ku hestek tevger û rîtmê didin temaşevan.

Jina Kurd di gelek berhemên wî de wekî hêmanek navendî derdikeve pêş, ew sembola axê, berhemdariyê û berxwedanê ye. Ew wê bi cilên xwe yên kevneşopî û rengîn ên bi nakiş nîşan dide, ku kûpek avê hildigire an jî li ser çiyayekî radiweste, ev yek têkiliya kûr a di navbera mirovahiyê û xwezayê de di çanda Kurdî de nîşan dide. Çiya jî hebûneke bi hêz in, ew ne tenê paşxaneyek erdnîgarî ne, lê sembola berxwedan û serhildanê ne. Rengên wan ji şîn bigire heya binefşî diguherin, mîna ku ew hem karakteran diparêzin û hem jî hembêz dikin.

Her çiqas ji mijarên kevneşopî sûd werbigire jî, wênesaz xwe bi şêwazek bi tevahî kevneşopî sînordar nake, ew rûyan jî wêne dike. Ev yekbûn hestek hemdem dide tabloyên wî û dihêle ku ew ji bo temaşevanek berfireh, hem di nav civaka Kurdî de û hem jî li derveyî wê, balkêş bin. Di gelek berhemên xwe de, ew xwe dispêre rengên germ ên wekî porteqalî û sor, ku îşaret bi germahiya têkiliyên civakî dike, di heman demê de şîn û kesk bikar tîne da ku xweza û aramiyê îfade bike.

**Pêşengeh û peyamek berdewam**

Di seranserê kariyera xwe ya zêdetirî 18 salan de, wênesaz beşdarî pêşangehên herêmî û navneteweyî bûye, ku li wir karê wî bala rexnegiran û kesên ku bi hunera mîratî re eleqedar dibin kişandiye. Wî gelek caran tekez kiriye ku armanca wî ne tenê nîşandana tabloyên xweşik e, lê di heman demê de ragihîne peyama ku nasnameya çandî dikare bêyî windakirina rehên xwe were nûkirin.

Wî her wiha atolyeyên xêzkirinê ji bo zarok û ciwanan lidar xist û tekezî li ser girîngiya fêrbûna mîratê bi rêya hunerê kir. Ew bawer dike ku nifşên nû ji bo ku wan bi dîroka xwe bidin nasîn, ji nêzîkatiyên hişk û kevneşopî dûr bikevin, hewceyê rêbazên dîtbarî yên nûjen in.

**Huner wekî Pirek di navbera paşeroj û niha de**



Di tabloyên vî Wênesazî de, mîrat ne statîk xuya dike, lê belê zindî û nûkirî ye. Ew ne tenê dîmena folklorîk ji nû ve çêdike, lê wê bi awayekî ku bi ruhê serdemê re têkildar be ji nû ve şîrove dike. Hêza projeya wî ya hunerî li vir e, ew folklorê vediguherîne zimanekî dîtbarî yê hemdem ku dikare bi çandên din re diyalogê bike.

Ezmûna wî ya zêdetirî hejdeh salan îspat dike ku huner dikare bibe amûrek berxwedana çandî, pirek di navbera paşerojê û niha de. Her çend dem diguherin jî, tabloyên wî şahidiya nasnameyeke sabît dimînin, ku bi firçeyê tê parastin û bi rengan ber bi pêşerojê ve tê hilgirtin.

## FERHENGA BIWÊJAN

**Temenê xwe xwariye:**
- Pir pîr bûye; êdî yê mirinê ye.

**Tir tê de nemaye:**
- Bêhêz bûye; pîr bûye; bi kêrî tiştekî nayê.

**Tir xwe lê nagirin:**
- Ji hêzê ketiye; perîşan bûye; extiyar bûye.

**Tirtir çûye virvir maye:**
- Bi heman wateyê.

**LI SER BEDEWIYA BERBIÇAV**

**Di serî de çîl û gewr e, di hundir de reş û jehr e:**
- Ji bo tiştên, yan kesên li ber çavan bedew lê di cewherê xwe de xirab tê gotin.

**LI SER JIYANA BIPIRSGIRÊK, DIRÊJKIRIN Û DOMDARIYÊ**

**Bû çîroka Rûstem:**
- Pir dirêj kir.

**Bû çîroka Memê Alan:**
- Bi heman wateyê.

**Bû xwîna Siyahoş:**
- Pir dom kir; çareser nebû; pir dirêj kir. (33)

Çîroka bûk û xesûyê ye.
- Zû naqede.

**Çîroka wî dirêj e:**
- Ez bêjim wê pir dem lê biçe.

**Ev dan wê hê gelek avê bikişîne:**
- Ev kar wê hê pir biajo; karekî dûdirêj e.

**Ev hevîr wê hê pir avê hilçine:**
- Bi heman wateyê.

**Ev hevîr wê hê gelek avê rake:**
- Bi heman wateyê.

**Te kir çîroka Rûstem:**
- Te pir dirêj kir.

**LI SER REQIS Û GOVENDÊ**

**Çokên xwe nerm kirin:**
- Reqisî; govend girt.

**Kurmên xwe rijandin:**
- Bi heman wateyê.

Kurmên xwe weşandin:
- Bi heman wateyê.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

**Bi kamîreya Narama Mihemed**



## Malbatên girtiyan: Em daxwaza zarokên xwe dikin



Malbatên dîlgirtiyan xiyaneta ku li zarokên wan hate kirin şermezar kirin û bang kirin ku çarenûsa zarokên wan bên diyarkirin, ji ber heya niha agahî li ser wan tuneye ku sax in an mirî ne û gotin; "Çavên me li rêya zarokên me yên dîlgirtîn e."**R-4**

## Îran û Israîl... Şerê li dijî sîstemê yan çekên nukleriyê?

Israîl û Amerîka derbeyên mezin li Îranê xistin, şerê wan di navbera parastina çekên nukleriyê û aliyê din têkbirina nukleriyê. Dibe ku sîstem were guhertin û neyê guhertin, lê di nava van geşedan û êrişan de yekrêziya gelê Kurd dibe kelehek li hemberî hemû sînaryoyên muhtemel.R-6



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1356 | 4-Adar-2026 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

## Bi têkoşîna jinên Kurd 8'ê Adarê bêhtir wate qezenc kir




Gaziyên jin diyar kirin ku 8'ê Adarê bû sembola jinên azadîxwaz û kedkar û gotin, "Bi têkoşîna jinên Kurd 8'ê Adarê bêhtir wate qezenc kir. Îro eger rohniyek ji bo jiyaneke bi rûmet û wekhev ava bûye, ev bi saya têkoşîna Tevgera Azadiya Jin e, ya bi têkoşîna Rêber Apo û şehîdan ava bûye."**R-10**

# LI HEMBERÎ PLANA FERMANEKE NÛ DIVÊ ŞENGAL WERE PARASTIN

Piştî geşedanên dawiyê yên ku li Rojava û Sûriyê qewimîne, tê plankirin ku fermaneke din li ser gelê Şengalê were dubarekirin, ev yek jî bi gotina Wezîrê Karên Derve yê Tirkiyê Hakan Fîdan hat xuyakirin ku got, "Piştî Rojava dora Iraqê ye" û bi taybet bal kişand ser Şengal, Kerkûk û Mexmûr. Niha jî hikumeta Iraqê bi amadekariyê leşkerî li derdora Şengalê sekiniye û xeteriya li ser civaka Êzidî careke din nû dibe. Li hemberî vê planê, parastina Şengalê erka tevahî gelê Kurd e.**R-2**



## 'Divê zarok bi zaroktiya xwe jiyan bike'




Berdevka Rêxistina Stêrk ya Şopandin û Parastina Mafê Zarokan Jûliya Xelo da diyarkirin ku di dorpêça Kobanê de zarok ji mafê xwe yê zaroktiyê hatiye dûrxistin û got, 'Divê zarok bi zaroktiya xwe jiyan bike."**R-7**

## 'Bi awayekî rêxistinî û rojane nan dighêje gel'

Hevserokê Komîteya Firneyan ya kantona Cizîrê Rondar Salih tekez kir ku pirsgirêkên nan bi giştî hatiye çareserkirin û bi awayekî rojane nan dighêje milet û got, "Rojane gerên şopandinê li ser nangehan pêktên. Kalîte, giraniya nan û cudahiya wê tê şopandin, da ku em karibin nanekî baş li gorî pîvanên ku tê xwestin, bigînin milet."**R-8**




Şerê Rojhilata Navîn
Farûk sakik R-4


Şerê Îranê... pêşbirka hegemoniya sedsalê ye!
Dilyar Cizîrî R-6


Civaka Îranê rûberûyî guhertinên stratejîk e
Ehmed Hesen R-8


Fikarên civakê di bin siya şer de
Gulîstan Xalid R-10

# Parastina civaka Êzidî erka tevahî gelê Kurd e

Jinên Êzidî li Rojavayê Kurdistanê dan zanîn ku gefên li ser Şengalê bi armanca dubarekirina fermanê ye. Herwiha jinên Êzidî tekezî li ser parstina mafê civaka Êzidî di destura Iraqê de kirin.

**Esma Miştefa/Qamişlo**

Bi geşedanên dawiyê yên ku li Rojava û Sûriyê qewimêne re, xuya dibe ku destwerdana Tirkiyê ji Iraq, Rojava û Başûrê Kurdistanê re ne li ber niyeta rawestandinê ye. Niha dixwazin bi gevxwarinên ji bo hikumeta Îraqê Şengalê tengav bikin û bi niyeta rûdana şer û êrişeke mezin, li ber sekinîne. Ev yek jî bi gotina Wezîrê Karên Derve yê Tirkiyê Hakan Fîdan re dema gotiye "piştî Rojava dora Iraqê ye" û bi taybet bal kişand ser Şengal, Kerkuk û Mexmûr. Ji ber vê yekê niha hikumeta Iraqê bi amadekariyê leşkerî li derdora Şengalê sekiniye û xeteriya li ser civaka Êzidê careke din nû dibe. Têkildarî van mijaran Berpirsa Yekîtiya Êzdiyên Sûriyê Suad Hiso û Berdevka Fermî ya Yekîtiya Jinên Êzidî li Rojava Hediye Şemo ji rojnameya me re axivîn.



Suad Hiso



Hediye Şemo

Suad di destpêka axaftina xwe de bal kişand ser serbestberdana DAIŞ'ê û hewildanên qirkirina civaka Êzidî û wiha got: "Ji bo gev û hewildanên êrişkirina Şengalê, hat xuyakirin ku piştî serbestberdan û vejandina DAIŞ'ê careke din di Sûriyê de ku bi taybet bi şerê li ser Rojavayê Kurdistanê re ev yek berbelav kirin. Her wiha veguhestina 5 hezar DAIŞ'î ji Iraqê re, gefên Hakan Fîdan yên ji bo Şengalê û rûniştinên ku di navbera rayadarên Îraqê de têne kirin, ev hemû xeteriya li ser pêkanîna komkujiyeke nû li ser Şengalê derdixe holê.

Ev yek metirsiya 2014'an ya fermana qirkirinê tîne bîra me. Di wê qirkirinê de me dît ku çawa îxanet hate kirin, hikumeta Iraqê di Musilê de çekên xwe ji DAIŞ re hêştin, her wiha 12 hezar Pêşmerge ji hundir Şengalê vekişiyan. Rastiya ku tenê hêza YPJ'ê, YPG'ê û YPŞ'ê li wê derê şer kirin û Şengal rizgarkirin, tikes nikare vê rastiye înkar bike. di wê demê de bi hezaran jin, gel û zarok hatin qetilkirin û revandin. Piştî 2015'an civaka Êzidî xwe kom kir, îradeya civaka Êzidî derket holê û xweseriya xwe avakirin her wiha rêxistinbvûyîn û hêzên xwe leşkerî avakirin û 11 sal in li ser re derbas dibe.

Îro careke din piştî êrişên Rojava xwestin berê xwe bidin Şengalê. Dixwazim viya jî bînim ser ziman ku di hevdîtinên Fermandar Mazlûm Ebdî bi dewletê re, jê hat xwestin ku QSD'ê tevlî artêşê bibe û li hember Heşd el Şabî şer bike. Û bi redkirina vê yekê û îlankirina seferberiyê re. helbet dizanîn ku xeteriyeke mezin ber bi Başûr ve diçe."

**'Divê mafê Êzidiyan di destura Iraqê de bê parastin'**

Suad derbarê amadekariyên hikumeta Iraqê û helwesta Başûrê Kurdistanê de û wiha bilêv kir: "Di van demê dawiyê de xuyaye ku amadekariyên berbiçev derbarê êriş û gefên li ser Şengalê de têne kirin. Hikumeta Iraqê niha hemû çekên xwe li wir amade kirine û çekên civakê yên kesên sivîl ji wan distînin ku armaca wan bêçekkirina civakê ye. Her wiha li hember vê rewşê bêdengiya hikumeta Başûrê Kurdistanê; ev her du wê çawa baweriyê li gel civaka Êzidî çêkin careke din?

Ev nîşaneya ku çawa berê di 14'an de bêdeng bibûn vê carê jî ev yek xwe dubare dike û xeteriyê li ser gel û civaka Êzidî nû dike. Armanca van ji van gef û êrişan; yek ku hêzên YPŞ'ê bi bin bixînin, Rêveberiya Xweser ya Şengalê hilweşînin her wiha îradeya gel bişkînin. Îro divê em ji hikumeta Iraqê re viya bêjin. Ger hikumeta Îraqê mafê civaka Êzidî di destura xwe de biparêze wê demê em ê çek deynin, heyanî niha tu maf û taybetmendiya civaka Êzidî li ser çavan re negirtiye. Ger ev maf neyê parastin, wê demê em ê jî parastina xwe bikin.

Ya din gelek welatên navneteweyî bi jenosîda li ser Civaka Êzidî hatiye kirin, bawer û qebûl nekirine. Yek ji wan dewletan jî Iraq ku her tişt li ser axa wê hate kirin, heyanî niha bi jenosayda Êzidiyan qebûl nekiriye."

Suad di dawiya axaftina xwe de bilêv kir ku ew bang li hikumeta Îraqê dikin ku mafê gelê Êzidiyan di destura xwe ya hundirîn de qebûl bikin û biparêzin, ger wiha neke divê leşkerên xwe ji Şengalê bikşîne û wê parastina xwe bikin. Divê di vê pêvajiyê de civaka Êzidî û gelê Kurd li ser piya be.

**'Rojava ji bo Şengalê alîkarê herê mezin bû'**

Hediye Şemo di axaftina xwe de bal kişand ser fermanên li ser Şengalê hatine kirin her wiha parstin û alîkariya Rojavayê Kurdistanê ji bo civaka Êzidî û wiha pê de çû: "Fermanên ku hatine kirin ji dîrokê heyanî niha li hember pêrozbûn û kevinbûna vê baweriyê hatin kirin. Hemû ferman jî bi destên hêzên nijadperest yên ku niha li ser serweriyê ne hatin kirin, fermana 2014'an jî bi destê wan hate kirin ku ya herî dijwar bû di dîroka mirovahiyê de. Em ji bîr nakin ku çawa Rojavayê Kurdistanê li kêlek Şengalê sekinî û dilê xwe ji civaka Êzidî re vekir. Gelê Kurd yê li Rojava bû hêz û desteka herî mezin ji Şengalê re."

**'Parastina Şengalê erka hemû gelê Kurd e'**

Hediye di domdariya axaftina xwe de ev anî ziman: "Parastina Şengalê erkekî bingehîne li ser hemû gelê Kurd. Gelê me yê li Ewropayê yên li çar aliyên Kurdistanê dibê piştgiriya vê pêvajoyê bikin. Bi van gef û pilanan re, armanckirina fermaneke nû tê kirin, hîna civaka Êzidî birînên xwe yên 2014'an derman nekiriye. Ji ber wê yekê guhertina qedera Şengalê erkekî li ser milê hemû Kurda ye. û di serî de divê hemû gelê Kurd bang bike da ku Hikumeta Iraqê mafê civaka Êzidî di destura xwe de biparêze."

# 'Jinek bibe dadmend ne xeyal e li Rojavayê Kurdistanê em dadmend in'

**Zana Roj/Qamişlo**

**Dadmenda di Edaleta Civakî ya kantona Cizîrê de Nifuse Hiso da zanîn ku civaka Rojhilata Navîn nikare jinê di lutkeya serkeftinê de bibîne ji ber wê şerê projeya Netewa Demokratîk dikin û got, "Jinek bibe dadmend ne xeyal e, li Rojavayê Kurdistanê em dadmend in."**

Di Nava Rojhilata Navîn ya ku di nava hişmendiya deh hezar salin hatiye fetisandin, li vê derê projeya Rêveberiya Xweser ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê dibe mînak ji hemû cîhanê re. Di cîhana ku gelek zehemet û kême ku em jineke dadmend bibînin û bi taybet Rojhilata Navîn de bi yek carî vê yekê qebûl nakin û xwendinekî bi vî awayî nakin milkê jinê. Di Şoreşa Rojavayê Kurdistanê de ku bû 14 sal in xwedî tecrûbeya Neteweya Demokratîke, jin di asta dadmendiyê de cihê xwe digrin û dibin cihê biryargirtina edaletî.

Têkildarî rolgirtina jin di dadmendiyê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê de dadmend Nifuse Hiso ji Rojnameya me re axivî.

**Pêşxistina jinê bandorê li zihniyetê dike**

Nifuse di destpêkê axaftina xwe de bal kişand ser gavavêtinên jin yên destpêkê di aliyê parêzerî û dadmendiyê de û wiha got: "Di destpêka Şoreşê de em weke hiquqnas tevlî bûn, em çend jinên hiquqnas me navendek vekir. Her wiha me navendek ya lêkolînan vekir da ku em girêdayî mijar û pirsgirêkên jin pê re dimînin lêkolînan çêbikin. Her wiha mala jin hate avakirin û wiha me bi hev re dest bi kar kir. Di wan salan de pirsgirêkê ku bi jinê re dihatin qewmandin ji pirsgirêkên heyî ne dur in. Her di aliyê hevjîn, malbat, zarok û civakê ve rastî pirsgirêkan dihat. Helbet ji ber civaka me jî ji hişmendiya ku di nava pergalê de hatiye belavkirin ne qut e. Lê belê em bi dema niha re hinekî tînin ber hev, ne ku zihniyeta mêr gelek hatiye guhertin lê belê jin bi cesaret, bi biryar, hêz, xwestek û bê ku serê xwe bitewîne derketiye holê. Ev yek jî bandor li mêr û zihniyeta civakê dike."

**'Jinek bibe dadmend ne xeyal e li Rojavayê Kurdistanê em dadmend in'**

Nifuse bal kişand ser hişmendiya ol ya li ser jinê û wiha bi lêv kir: "Di ol de dibêjin ku jin hestiyar e, û di mîras, şehadet û her tiştî de nîv dihesibînin. Ev yek her çiqas civak û jiyana mirovan pêşketiye jî lê di ol û baweriyan de ev zihniyet hê jî tê parastin. Heya niha jî tu baweriya wan bi gotin û biryarên jinê çênabin. Ev yek jî di tevahî Rojhilata Navîn de heye û guhertina wê jî qebûl nakin.

Ev ne tenê bi ol ve girêdayî ye, di esas de bi hişmendî û fikir ve girêdayî ye. Civaka Rojhilata Navîn nikare jinê di lutkeya serkeftinê de bibîne. Nikare jinê di cihên biryardariyê de bibîne. Ji ber wê jî ev hişmendiyên seqet şerê me û pirojeya me dikin. Civakek di hin aliyan de xwe gelek li pêş dibîne û avahiyan radike, lê di aliyê jin, maf û ol de hê jî bi dest û lingan li pey kevneşopiyên xwe ne. Lê belê em dibînin ku di tecrûbeyên xwe re ku ev tişt ne xeyalî ye, dadmendek bibe jin ne ku nabe, ne ku nikare biryar bide û bi edalet tevbigere, em dadmend in û bi dehan hevalên min yên jin hene ku di nava vê projeyê de dadmendiyê dikin."

**'Bila li ezmûna Bakur û Rojhilatê Sûriyê binêrin, çawa ku jin dibin dadmend'**

Nifuse di dawiya axaftina xwe de ev anî ziman: "Di Rojavayê Kurdistanê de jinan hemû qalibên civakî, olî û hişmendî yên kevneşop yên li ser jinê guhertin û bandora xwe li ser



hemû pêkhateyên di herêmê de kirin. Ev yek ne tenê di Rojava de dan avakirin bi cêhwaziya xwe karîn ku bala hemû cîhan û civakên derve jî bikşînin. Em bi hêvî ne ku piştî van guhertinên ku di Sûriyê de hatine çêkirin em bikaribin bandorê li ser hişmendiya heyî bikin. Her wiha hebûna jinê di hemû alî û xebatan de diyarker bibe. Jin dikare bike parêzer, dadmend, hevjîn û dayîk jî. Tu kes nikare li pêşiya xwesteka jinê bibe asteng. Tenê divê hişmendî bê guhertin û binêrin li ezmûna Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku çawa jin dikare bibe dadmend û biryarên edaletî bistîne."



# Ji kongreya (SP)... Parastina Rojava berpirsiyariya civaka navneteweyî ye

Partiya Sosyalîst (SP) li Swîsreyê, di kongreya xwe ya giştî ya li Bienne de bang li Konseya Federal kir ku ji bo parastina Rojava tedbîran bigire.

**Navenda Nûçeyan**

Partiya Sosyalîst (SP), ku yek ji mezintirîn partiyên Swîsreyê ye, di kongreya xwe ya giştî ya li Bienne de biryarek girêdayî Sûriyê pejirand û bang li Konseya Federal kir ku ji bo parastina Rojava tedbîran bigire. Partiya Sosyalîst a Swîsreyê di kongreya xwe de derbarê Rojava de hin biryar standin. Di daxuyaniya ku bi yekdengî ji hêla delegeyan ve hat qebûlkirin de, li dijî êrişên li ser Rojava nerazîbûn hat nîşandan û banga parastina Rojava hate kirin.

**Nerazîbûneke nû ya navneteweyî ji Swîsreyê**

Li hember êrişên hêzên hikûmeta demkî ya Sûriyê yên ku ji aliyê dewleta Tirk ve tên piştgîrkirin yên li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê (Rojava), nerazîbûneke nû ya navneteweyî ji Swîsreyê hat. Di axaftinên beriya biryarê de ku ji hêla Hevseroka Daireya Koçberiyê ya SP'ê Sînem Gokçen, ji Tevgera Jinên Kurd a Swîsreyê Ozen Aytaç û endama Parlamanta Federal a SP'ê Valerie Piller Carrard ve hatin kirin, hate destnîşan kirin ku êrişên li ser Rojava herêmê bêîstîqrar dikin. Hate gotin ku modela rêveberiya xweser a demokratîk di warê azadiya jinan, jiyana hevpar a gelan û demokrasiya herêmî de alternatîfek girîng pêşkêş dike. Hate ragihandin ku "parastina Rojava berpirsiyariya civaka navneteweyî ye".

**Kobanê di bin dorpêçê de ye û korîdoreke mirovî ya ewle tune**

Di kongreyê de pankartek bi nivîsa "Hevgirtina bi Rojava re" hate hildan û Hevserokê Giştî yê SP'ê Cedric Wermuth ji bo nîşandana hevgirtina xwe li pişt wê pankartê rawestiya. Biryar ji aliyê delegeyan ve bi yekdengî hate pejirandin.

Di daxuyaniyê de, hat destnîşankirin ku şerê li taxên ku Kurd lê dijîn, bûye sedema krîzeke mirovî ya cidî û bi deh hezaran kes koçber bûne. Hat diyarkirin ku lihevkirina ji bo agirbestê di pêvajoyeke hesas de derbas dibe û hat gotin ku ewlehiya kêmneteweyan hê nehatine misogerkirin. Di daxuyaniyê de hat ragihandin ku gihîştina alîkariya mirovî hîn jî sînordar e û hat gotin ku Kobanê di bin dorpêçê de ye û korîdoreke mirovî ya ewle tune.

Di biryarnameyê de tê gotin ku Swîsre ji ber kevneşopiya xwe ya dîplomasiya mirovî û statuya xwe wekî parêzvanê fermî yê Peymanên Cinêvê berpirsiyariyek taybet hildigire ser xwe. Ji Konseya Federal hat xwestin ku bi demildest peywira xwe ya "parastina kêmneteweyên etnîkî û olî li Sûriyeyê" bi cîh bîne.




**DAXWAZ**

-Divê Swîsre di asta du alî û navneteweyî de ji bo parastina sivîlan û kêmneteweyan înîsiyatîf bigire.

-Divê piştgiriya çavdêriya agirbestê û mafê vegerê ji bo kesên koçberkirî bike; û hewldanên dîplomatîk zêde bike.

-Divê alîkariya mirovî zêde bike; bi taybetî piştgiriya bijîşkî, xwarin, stargeh û psîkososyal bi rêya saziyên Neteweyên Yekbûyî peyda bike.

-Divê gihîştina rêxistinên alîkariyê bo herêmê misoger bike; û hewldanên dîplomatîk bide destpêkirin da ku dorpêça Kobanê bi dawî bibe.

-Divê lêpirsînên li ser binpêkirinan û darizandina berpirsiyaran bixwaze.

-Divê piştgiriya ji bo avahiyên sivîl di warên mafên mirovan, perwerde, tenduristî, jin û ciwanan de zêde bike.

-Divê piştgiriya dîplomatîk û mirovî xurt bike da ku avahiya xweser û demokratîk a herêmî ya Rojava biparêze.

# Bandora girtina Tengava Hirmizê li ser Kenala Siwês

**Navenda Nûçeyan**

**Dewletên Yekbûyî yên Amerîka û Îsraîlê ji 28'ê Sibatê ve êrişên leşkerî li dijî Îranê dest pê kirine, di bilindbûna asta êrişan de Îran Tengava Hirmizê girt, ev yek dê metirsiyekê mezin li ser derketina tevliheviyê di nava bazarên petrola cîhanî û bilindbûna bihayan de çêdike.**



Dibe ku girtina Tengava Hirmizê bi awayek nerasterast bandorê li ser tevgera Kenala Siwêsê bike, ji ber ku Tengava Hirmizê Kendava Erebî, Kendava Uman û Deryaya Ereb bi hev girê dide. Tenagav Hirmizê dergeha deryayî ye ku di rêya wê de piraniya hinardekirina petrolê ji dwletên kendavê ber bi bazarên cîhanî derbas dibe, bi taybet Asiya û Ewropa. Rojane nêzî ji sedî 20 ji petrola cîhanî tê de derbas dibe.

**Bandora girtina Tengava Hirmizê li ser kenala Siwês**

Kenala Siwês deryaya Sor û deryaya Spî bi hev girê dide û bi awayekî sereke ji bo veguheztina petrol, kel û pelan ji Rojhilata Navîn û Asiya bo Ewropa û Emerîkayê tê bi karanîn, dema ku Tengava Hirmizê bê girtin, dibe ku bandor li ser şandina petrola ji Kendavê bo Ewropa bibe, dê ev yek bibe sedema zêdebûna li ser daxwazên xetên boriyên alternatîf an jî bikaranîna benderên alternatîf ji bo veguheztina petrolê berî ku di kenala Siwês de derbas bibe. Piraniya petrola Kendavê ya ku di rêya Tengava Hirmizê diçe Ewropa bo Deryaya Sor hem di rêyên bejahî û deryayî de derbas dibe, piştre dighêje Kenala Siwês. Eger derketina petrolê ji Kendavê bi sedema Tengava Hirmizê raweste, hejmara keşteyên ku di Kanala Siwêsê re derbas dibin dê kêm bibe, dibe ku bibe sedema kêmbûna demkî ya dahatên ji xercên barkirinê, lê ew ê nebe sedema girtina kanalê bi xwe. Dibe ku hin dewlet hewl bidin ku bikaranîna rezervên petrolê yên li benderan an jî boriyên rojhilat-rojava yên li Erebistana Siûdî barkirinan bi rêya Kanala Siwêsê zêde bikin, ku ev dikare zextê li ser kanalê zêde bike.

**Alternatîfên li pêşiya çavkaniyên petrol û xaza Kendavê eger Hirmizê bê girtin**

Hin dewletên Kendavê, bi pêşengiya Erebistana Siûdî û Îmaratên Yekbûyî yên Erebî, îstîsmarên xwe di avakirina torên bejayî yên pêşketî de ji bo veguhestina petrol û xaza xwezayî zêde kirine, ji bo misogerkirina berdewamiya herikîna dabînkirinê bo bazarên cîhanî di rewşa zêdebûna aloziyan de ku dikarin navîgasyona li Tengava Hormuzê asteng bikin. Nêzîkî çaryeka barkirinên petrolê yên cîhanê yên bi rêya deryayî ji wê derbas dibin.

Erebistana Siûdî xwediyê yek ji van alternatîfên herî berbiçav e ew jî, "Xeta Boriya Rojhilat-Rojava", ku petrola xam ji zeviyên hilberînê yên li herêma Rojhilat vediguhezîne benderên hinardekirinê yên li perava Deryaya Sor li rojavayê welêt, ku bi sedan kîlometreyan di nav axa Siûdî de dirêj dibe.

Ev xet vebijarkek stratejîk e ku dihêle Riyad beşek girîng ji hilberîna xwe ji Tengava Hirmizê dûr bixe, nemaze ji ber gefên dubare yên girtina wê di demên aloziyên herêmî de.

Ev borî bi qasî 1200 kîlometre dirêj e û rojane bi mîlyonan bermîl ji zeviyên mezin yên wekî (Beqîq, Xewar û Xurês) li rojhilat heta bendera Yenbû li ser Deryaya Sor vediguhezîne, ku ev yek ji bo wê deriyek hinardekirinê ya ewle peyda dike.

Li Îmaratên Yekbûyî yên Erebî, boriyên petrolê yên (Hebşan-Fuceyrayê) wekî çareseriyeke alternatîf a girîng derdikeve pêş, ji ber ku ew ji zeviya bejayî ya Hebşanê li Îmarata Ebû Dabî heta bendera Fuceyrayê ya ku li ser Kendava Umanê dinêre dirêj dibe.

Girîngiya wê ew e ku Ebû Dabî dikare petrola xwe rasterast ber bi Okyanûsa Hindî ve bişîne bêyî ku ji Tengava Hirmiz derbas bibe, bi vî awayî ewlehiya dabînkirinê di demên aloziyê de zêde dike.

**Rageşiya di navbera Emerîka, Îsraîl û Îranê de û destwerdanên leşkerî li herêmê**

Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê û Îsraîlê roja Şemiyê 28'ê Sibatê, bi armanca jiholêrakirina bernameya mûşekî ya Îranê û gefên li ser herêma Erebî, êrişên asmanî li ser Îranê pêk anîn. Ev yek bû sedema kuştin û birîndarbûna bi dehan kesan li hundirê Îranê, di heman demê de Îranê jî ragihand ku wan hemû baregeh û avahiyên leşkerî yên Emerîkî li herêma Kendavê kirine hedef û li dijî Îmaratên Erebî yên Yekbûyî, Behrên, Qeter, Erebistana Siûdî û Îsraîlê êriş pêk anîn herwiha li çend deverên hundirê Îsraîlê perçeyên mûşekan ketin.

Çend welatên ewropî, erebî û îslamî êrişa Emerîkî û Îsraîlê herwiha êrişên tolhildanê yên Îranê li ser welatên Kendava Erebî şermezar kirin.

Di heman demê de, Pentagonê berdewamiya êrişên xwe yên li ser Îranê di bin navê Xezeba Efsanewî "Operasyon Epic Fury" de ragihand, ku Îranê bi berdewamiya hedefgirtina welatên Kendavê û Îsraîlê di bin navê Soza rastîn "Operasyon True Promise" de bersiv da.

# Veguhestina Sûriyê ber bi serdema taritiyê bi destê hikumetê

**Medya Miqdet**



Serî rakirin û raperînên ku di sala 2011`an li dijî rêjîma Baas a ruxyayî ku hatin destpêkirin, bi demê re bi xwe re şerên navxwayî di nava gelên ku di Sûriyayê jiyan dikirin ava kir her wiha ji wê xetertir bi zimanek din em dikarin bêjin ku derî ji bo avabûna komên çetetiyê jî da vekirin û bi zemîn kir. Ji xwe bi destwerdanên hin dewletên Rojavayî û ya Xelîc di milê dayina çekan ya ji bo van koman jî bû sedema herî sereke ku li Sûriya yê şerên giran ku bi xwe re alozî da avakirin û heya roja me ya îro tê berdewam kirin jî ava bike.Mînaka herî zindî jî ku tovên wê heya roja me ya îro dewam dike jî avabûna rêxistina Cebhet El Nesra ku bingeha xwe ji rêxistina El Qa`êdê digirt ku ew jî di sala 2012 an xwe berda nava xaka Sûrî û heya roja me ya îro di bin nav û teşeyên cuda dîsa tekoşîna pêkanîna îslama radîkal ango îslama Sunî dikin. Rêxistina DAÎŞ ku avakerê wê Ebu Misab El Zerqawî bû ev rêxistin di sala 2014`an derbasî nava xakên Sûriya yê bû bi wê derbas bûnê re êdî li Sûriya yê dest bi pêvajoyek nû ya kuştina mirovan bi şêwazên cuda weke serîjêkirin hat dest pêkirin her wiha ferzkirina ola îslamê û pêkanîna rêgezên wê bû cihê serîjêkirina mirovan ger nedin pêkanîn. Bi sedan komkujî derheqê civaka Sûrî hatin kirin çimkî her sê rêxistin ji hev ne cuda bûn hemî jî eynî hovîtî didan meşandin û li ser heman bingehê belavbûna xwe berfereh dikirin. Xwestin ku Sîstema Esad di Sûriyayê de bi sedema ku ew bi xwe bûn cihê destpêkirina aloziya li Sûriya yê, ji holê rabikin lê di rastiyê de xwestin bingeha tariqet ango mezheba Elewitiyê ku rêjîma Baas wê mezhebê ji xwe re esas digirtin bidin bi dawî kirin û îslama Sunî bidin ferzkirin. Bê guman derbas bûna van kom û rêxistinên terorist di nava Sûriya yê de vedigere parastina ne cidî ya rêjîma Sûrî. Dewletek bi dewletbûna xwe nikarî li hember rêxistinên terorist tekoşîn bikira ev jî yek ji sedemên sereke ya hilweşîna rêjîma Baas çimkî li ber çavên wî gelê wî dihatin kuştin lê ew xwe radestî radestbûnê kiribû ev yek jî bû sedem ku hêrsa gel li hember rêjîmê bilindtir bû. lê xalek serek jî hebû ku weke piştperdeyek ku rêjîm Baas xwe li pişt wê dida veşartin ew bû ku “Wê demê Rêjîma Sûriyê û DAIŞ ji hev sûd werdigirtin.Beşar Esed bi awayekî ne rasterast piştigirî dida çalakiyên leşgerî yên DAIŞ’ê, ji ber ku hebûn û berdewamiya DAIŞ îdiayên rêjîma Sûriyê di sala 2011`an de li dijî îslamiyetên tundrew şer dikir, û bi vê awayî opozîsyona Sûrî bê bandor dikir. Di milekî din de xwe radesti dewletên navneteweyî weke Emerika da ku bibe alîkar bi Sûriyayê re”. Gelek şervan ji ber sedemên aborî tevlî DAIŞê bûn. Mînak, li Sûriyeyê, hin şervanan ji Artêşa Azad a Sûriyeyê derketin, ku mehê 60 dolar ji bo wan dihat dayîn, û tevlî Cebhet Nusra bûn, ku mehê 300 dolar pêşkêşî wan dikir. Paşê ew tevlî DAIŞê bûn, ku bi vê awayi perên ji wan bilindtir pêşkêşî wan dikir. Rêxistina DAÎŞ bi demê re têkçûnek mezin di Sûriya yê de jiyan kir her wiha şopên wê jî hatin paqijkirin ev yek jî bi saya Hêzên Sûriya Demokratik QSD û bi alikariya hêzên Koalisyonê ku gelek oparesyonê dijî wan li Reqa,Tebqa,Dêrezor û Kobanê û h.w.d kirin û ev çalakî ango serdegirtin bi tunekirina DAÎŞ bi encam bû. Şerê li dijî DAÎŞ li bajarê Kobanê jî serkeftinên pir mezin ji bo pêkanîna ewlehiyê û dawî anîna li serdema taritiyê bi xwe re anî. Bi hilweşîna rêjîma Baas û hatina HTŞ’ê li ser textê desthiledariyê di roja me ya îro de Sûriya carek din rastî serdemke tari tê eger pêşiya wê neyê girtin. Çimkî hikumeta heyî bi xwe destpêkê endam û payebilind bûn di nava van rêxistinê terorî de, destê wan hîna di xwîna gelê Sûrî de hene lê îro dubare Sûrî sîneryoya terortiyê jiyan dike tevî ku Emerika ji Ehmed Alşera xwestibû ku Ehmed Alşera leşgerên biyanî her wiha çeteyên DAÎŞ’ê ji nava xwe rabike lê belê ev yek bi temamî bingeh nehat girtin. Radestkirina Hêzên Sûriya Demokratik QSD ya Dêrhafir, Reqa, Tebqa, Dêrezor bû hikumeta veguhêz li gor hin dane û peymanên ku hatine îmzekirin wê demê li wan bajaran ala DAÎŞ hatin bilind kirin û Ehmed Alşera jî ketina Dêrazor ya destê wan de weke serkeftinek ji bo çekdarê xwe dît ku ew gelek şer di destpêka aloziya û heya salên 2017’an têde dan meşandin da ku wan deveran bixin destê xwe. Di roja îro de leşgerên hikumetê li ser destê DAÎŞ’ ê tên kuştin lê belê Ehmed Alşera nikarî bibe xwedî bersiv li hember wan ji ber ku eger Ehmed li gor daxwaza Emerika tevbigere û DAIŞ ji Sûriyayê dawî bike wê li ser destê DAÎŞ’ê weke Oseme Bin Ledin lê were kirin çimkî van demên dawî de gelek gef lê hatin kirin, ger bi ya Emerika neke wê ji ser textê desthiledariyê bê rakirin. Di milek din de jî ku îro leşgerên wî pêşberî wî tên kuştin bê deng dimîne ew jî weke Beşar Esed li bendê ye ku mijar deng vede û alikarî ji aliyê Amerika ji bo wî were şandin.. Lê belê Divê Tirkiye rê bide balafirên hevpeymaniya navneteweyî ku baregehên Tirkiyê bikar bînin, da ku ew bikaribin bi awayekî çêtir bigihîjin hedefên li hundirê Sûriyeyê lê heya roja îro jî komên çeteyan yên di Sûriya yê de cih digrin ji aliyê dewleta Tirk jî alikar dibin û dewlet jêre dibe palpişt. Ji bo vê tekez tişta tê xwestin da ku pêşî li vekirin û gorkirina hebûn û tevgera çeteyan bigre ew e ku zext li dewletên ku dibin palpişt ji van koman re bikin çimkî dewletek bi dewletbûna xwe dema nikaribe pêşî li tevgerîna çeteyan bigre wê çi ji çarekirina aloziya Sûriyê re bike?? Aloziyek wiha demdirêj hewcedariya xwe bi siyaset û rêveberinek demokrat heye her wiha hewce heye ku hişmendiyên yekperest û dogmatik were rakirin li şona wê di vê hişmendiyek ku sosyalizima civaka demokratik di xwe de radike, jêre zemîn were ava kirin. Ger wisa nebe wê kaos û qirîz ne tenê li Sûriyê dewam bike li Rojhilata navîne tevda çimkî wê derbe li pêvajoya aştiyê bixe û Sûrî veguhêze qada şer . Di heman demê de heger pêvajoya siyaseta Demokratik û zagonê were destpêkirin heger rewşa belavbûna çeteyan neyê çareserkirin wê civaka Rojhilata navîn di qirkirinê re derbas bibin ji ber ku heya roja îro jî dewletên navneteweyi li hember ji nûva zindîbûna DIAŞ bi tevgerên cidî ranebûye. Sûriya jî mînaka herî berbiçav e.



## Fikarên civakê di bin siya şer de

**Gulîstan Xalid**

Di cîhana îro de, pirsa “Gelo Şerê ku îro ji welatekî derbasî welatekî dibe, wê ber bi kuve biçe?” êdî ne tenê mijarek e ku ji hêla siyasetmedar an pisporên leşkerî ve tê nîqaş kirin. Dayikek ku li kolanê dimeşe, ciwanek ku diçe xwendinê, bavek ku ber bi kar ve dibeze... Her kes heman pirsê dipirse: Dê çi bibe?
Bi taybetî pêşketinên li Rojhilata Navîn dibin sedema ku ev fikar hîn bêtir mezin bibe. Berfirehbûna pevçûnên li herêmê û tevlêbûna welatên cûda di vê pêvajoyê de fikarê ku şer dibe ku bê sînor belav bibe, xurtir dike.
Weke ku me dît, li Rojava, li bakur û rojhilatê Sûriyeyê demek dirêj bû ku ji bo hêzên cûrbecûr qada şer bû, herî dawî jî êrîşeke ku nedixwest bisekine destpê kiribû. Aloziyên li derdora taxên Şêx Meqsûd û Eşrefiye li Helebê nîşan dan ku çawa pevçûnek herêmî dikare bibe pevçûnek siyasî û leşkerî ya berfirehtir.
Ev pêşketin ne tenê bandorê li gelê herêmê dikin, lê di heman demê de bandorê li welatên ku ji hêla siyasî an leşkerî ve di herêmê de beşdar in jî dikin. Her welatek hewl dide ku berjewendiyên xwe biparêze an berfireh bike. Ev dikare bibe sedema bertekek zincîrî ya pevçûnên zêde.
Mirov tam ji ber vê sedema ku dîrok nîşan dide çawa şerên herêmî dikarin veguherin şerên cîhanî, ditirsin.
Rewşa şer ne tenê bandorê li ser leşkerên li eniyên pêş dike, lê di heman demê de li ser mirovên li malê jî bandor dike. Zarok ji wêneyên ku li ser televîzyonê dibînin bandor dibin, tirsên ku ew nikarin fêm bikin dijîn. Ciwan hîs dikin ku planên wan ên pêşerojê ne diyar dibin. Perwerde, kariyer, xewn… hemî bi pirsa “Ger şer nesekine çi dibe?” têne xeniqandin. Dayik û bav li ser ewlehiya zarokên xwe ditirsin. Pirsgirêkên wekî îhtîmala koçberiyê, krîza aborî û gihîştina pêdiviyên bingehîn şûna axaftinên rojane digirin. Heta axaftinên asayî jî niha ji ber berdewamiya şer têne qut kirin. Hişê mirovan bi berdewamî di hişyariyê de ye.
Peyama Siyasî ya Şer: Israra li ser bidestxistina tiştê ku mirov bi hêzê dixwaze wêneya ku îro li gelek welatan tê dîtin ev e: Dewletan dest bi karanîna hêza leşkerî ji dîplomasiyê bêtir bi awayekî berbiçav kirine, tiştê ku dixwazin bi şer digirin.
Li aliyeke din dîrok nîşanî me dide ku şerên mezin bi biryarek ji nişka ve dest pê nakin, lê bi kombûna krîzên li pey hev dest pê dikin. Nakokiyên piçûk, hesabên xelet û nîşandana hêzê ya hevbeş dikarin bibin sedema aloziyên mezin. Lêbelê, dîrok her wiha nîşan dide ku dîplomasî û zexta navneteweyî dikarin pêşî li şeran bigirin. Aboriya cîhanî, teknolojî û torên ragihandinê îro ji berê pir zêdetir bi hev ve girêdayî ne. Ev yek lêçûna şerekî mezin ji her demê girantir dike.
Yekîtiya gelan jî di pêvajoyên şer de giringe, ji ber yên ku di şer de serketî ne pir caran gel in. Dayik zarokên xwe winda dikin, ciwan pêşeroja xwe winda dikin. Ev êşa hevpar dikare hişmendiyek hevpar biafirîne. Lêbelê, ev yekîtî pêwîste ku mayînde û rêxistinkirî be. Ne tenê tirs, lê daxwazek hişmend û domdar ji bo aştiyê hewce dike.

# Bi têkoşîna jinên Kurd 8’ê Adarê bêhtir wate qezenc kir

**Navenda Nûçeyan**

Gaziyên jin diyar kirin ku 8’ê Adarê bû sembola jinên azadîxwaz û kedkar û gotin, “Bi têkoşîna jinên Kurd 8’ê Adarê bêhtir wate qezenc kir. Îro eger rohniyek ji bo jiyaneke bi rûmet û wekhev ava bûye, ev bi saya têkoşîna Tevgera Azadiya Jin e, ya bi têkoşîna Rêber Apo û şehîdan ava bûye.”

Li tevahî cîhanê û bi taybet li Kudistanê 8’ê Adarê Roja Jinên Kedkar a Cîhanê bi coş û heyecaneke mezin tê pêwazîkirin. Gaziyên jin têkildarî vê mijarê nêrîn û nirxandin kirin.

**‘Em ê xwedî li ked û berxwedana jinan derkevin’**

Gaziya şer Ezîme Zagros di destpêka axaftina xwe de 8’ê Adarê li tevahî jinên şoreşger, kedkar û têkoşer pîroz kir û got, “Ez weke gaziyeke jin têkoşîna jinên kedkar a sala 1857’an li bajarê New Yorkê ji bo mafên xwe têkoşiyan û ji bo vê jiyana xwe ji dest dan bi rêzdarî bi bîr tînim. 169 sal di ser wê berxwedanê re bihurî. Lê ev berxwedan bi dawî nebû. Bi têkoşîna jinên Kurd 8’ê Adarê bêhtir wate qezenc kir. Weke jinên Kurd li kîjan devera cîhanê dibe bila bibe em ê xwedî li ked û berxwedana jinan derkevin. Ji bo jin ji bin serwerî, zext û zilma zîhniyeta mêrperest û qatilê kastîk derkevin em ê berxwedana xwe pêş bixin.”
Ezîmeyê bal kişand ser têkoşîna Rêber Apo ya ji bo azadiya jinan û ev anî ziman, “Rêber Apo ji bo jin têkildarî rastiya xwe û civakê serwext bibe kedeke muezem dide. Di tevahî tehlîl, nirxandin û hevdîtinên xwe de behsa têkoşîna jinan dike.”
Gaziya şer Ezîme Zagros destnîşan kir ku zanebûn û fêmkirina pirsgirêkên xwe jî rengek ji rengên azadiyê ye û wiha axivî, “Azadî tiştekî wer bi hêsanî were bidestxistin nîne. Ked, têkoşîn û berxwedan pêwîst dike. Jinên Kurd ji bo azadiyê berdêlên mezin dan. Wê ew berdêl wisa vala neçin. Em ê bi têkoşîna xwe azadiya xak, civak û hemû jinan pêk bînin. Li ser vî esasî pêwîst e hemû jinên bi hesreta azadiyê ne 24 saetan bênavber têbikoşin, ti kelem û astengiyan nas nekin. Eger têkoşîna jinan a ji bo azadiyê raweste wê koletiyeke hîn xerabtir pêk were. Nexwe divê ku jin qet xwe ji bîr ve nekin û têkoşîna xwe berdewam bikin.”



Ezîme Zagros



Zarîn Kobanê

**‘8’ê Adarê roja hevgirtina jinan e’**

Gaziya şer Zarîn Kobanê jî anî ziman ku 8’ê Adarê li hember her cure bêmafî û neheqiyan bilindkirina ala berxwedanê ye û wiha axivî, “Bi rastî jî ev roj, roja hevgirtin, rêxistinkirin û têkoşîna hemû jinan e. Berxwedana 8’ê Adarê li hember biçûkxistin û kolekirina jinê helwesteke herî esîl e. 8’ê Adarê bû sembola jinên azadîxwaz û kedkar. Jinên Kurd vê berxwedan û îradeyê bi salan e nîşanî dost û dijminan dikin. Li hember çeteyên herî hov ên cîhanê artêşa jinan a Kurd YPJ’ê li Rojavayê Kurdistanê, Bakur û Rojhilatê û Sûriyeyê berxwedaneke herî bi rûmet pêş xistin.”
Zarînê axaftina xwe wiha domand, “Bêguman wê têkoşîna min her berdewam bike. Roj bi roj wê hîn bi hêztir bibe. Îro eger rohniyek ji bo jiyaneke bi rûmet û wekhev ava bûye ev bi saya têkoşîna Tevgera Azadiya Jin e ya bi têkoşîna Rêber Apo û şehîdan ava bûye. Em ê weke gaziyên jin vê têkoşîn û berxwedanê bilind bikin. Bi vê wesîleyê 8’ê Adarê li hemû têkoşerên bi rûmet pîroz dikim.”



# Gefên li ser Şengalê berdewamiya Komploya Navneteweyî ye

Tirkiyê di Sûriye de bi piştgiriya komên çete û HTŞ`ê, şertên guherîna rejîmê amade kir. Piştre jî ber bi siyaseteke ku armanca wê têkbirina destkeftiyên Kurdan bû. Niha jî tê gotin ku dixwaze heman rêbaz û modelê li Îraqê jî bi kar bîne.

**Viyan Egîd/Qamişlo**

Êzidî ku yek ji civakên herî kevnar ên Rojhilata Navîn in, careke din bi tehdîdeke hebûnî re rû bi rû ne. Tehdîdên eşkere yên Wezîrê Derve yê Tirkiyê Hakan Fidan ên li dijî Şengalê, operasyonên berhevkirina çekan yên ku artêşa Iraqê li herêmê da destpê kirin û avakirina bingehên leşkerî yên nû, şert û mercên beriya jenosîda ku DAIŞ‘ê di sala 2014’an de pêkanî yek bi yek bi bîr tîne. Çarenûsa gelekî ku 73 ferman jiyaye, di bin siya hevsengiyên hêzên herêmî û navdewletî de careke din ber bi nediyariyê ve tê kişandin. Ev analîz, pêşketinên rojane yên li Şengalê di çarçoveya dîrokî, siyasî û jeostratejîk de dinirxîne û armanc dike ku asta tehdîdên li hember gelê Êzidî eşkere bike.

**Çima Şengal?**

Erdnîgariya Şengalê, li xala hevgirtineke krîtîk a ku Iraq, Sûriye û Başûrê Kurdistanê bi hev ve girêdide cih digire. Ev pozîsyona jeostratejîk, herêmê datîne navenda nakokiyên berjewendiyên hêzên herêmî û navdewletî.
Ji bo Tirkiyê Şengal rola pişta paşîn a Rojavayê Kurdistanê dilîze. Enqere bi destwerdana Şengalê armanc dike ku Rojava dordor bike, destkeftiyên Kurdan tasfiye bike û li ser xeta Mûsil-Kerkûkê xwediyê gotinê bibe. Di heman demê de dixwaze li ser xeta ku diçe Deyrazorê pozîsyoneke stratejîk bi dest bixe. Tirkiyeyê bi derewên PKK’ê li ser axa Iraqê bi dehan bargehên leşkerî ava kiriye û hebûna xwe ya li herêmê didomîne. Lê belê piştî pêvajoya aştiyê windakirina vê derewê, bi awayekî eşkere dike ku niyeta rastîn a Enqarayê dagirkirina herêmê û afirandina kaosê ye.
Herwiha Şengal ji bo Îranê halqeyeke krîtîk a korîdora Şîa ye ku ji Tehranê heya Derya Spî dirêj dibe. Îran ku bi riya hêzên Haşdî Şabî li herêmê cih digire, Şengalê ji bo ewlehiya vê korîdorê neçar dibîne. Amerîka û hêzên Rojavayî jî li herêmê siyaseteke hevsengiyê ya li gorî berjewendiyên xwe dişopînin. Dema ku zext li ser Iranê tê zêdekirin, pozîsyona stratejîk a Tirkiyê ya wek hevalbendê NATOyê tê parastin; di vê hevkêşanê de çarenûsa Êzidiyan pir caran ji rojevê derdikeve. Li navenda van hemû hesaban gelekî zindî heye: Êzidî. Civakek ku bi hezaran sal li van erdê heye, bawerî û çanda xwe diparêze û jiyana xwe didomîne, li ser textereşa jeopolîtîk a hêzên herêmî wek piyonê tê bikaranîn.

**Ferman**

Li ser civaka Êzidî heta niha 73 ferman ên tên zanîn pêkhatine, herwiha bi dehan fermanên din jî hene kes ne hejmara kesên hatine qetilkirin, sûrginkirin û windakirin ne jî dîroka wê dizane. Êzidî êrişên qirkirinê bi gotina “ferman”ê pênase dikin. Êrişa destpêkê ya herî berfireh a tê zanîn, di sala 906’an de dest pê kir.

**Fermanên ku li ser civaka Êzîdî hat meşandin;**

51 ferman di dema paşayên Osmaniyan de li ser civaka Êzidî hatiye kirin, di van fermanan de Ereb û Kurdên herêmê yên Misilman jî cihê xwe di van qirkirinan de girtine.
- Di sala 906`an de Waliyê Mûsilê Hamadanî, ji ber ku Îslamiyet qebûl nekirin komkujî kir.
- Di sala 1246`an komkujiya li Laleşê, ku ji aliyê begê Zengî yê Mûsilê Bedreddîn Lûlû ve hate kirin.
- Di sedsala 16`an, bi fetwa Şêxulîslamê Osmanî Ebû Siûd Efendî û bi fermana Qanûnî Sûltan Sulyeman, li Şêxanê komkujî li Êzidiyan hate kirin.
- Di sala 1638`an, Waliyê Amedê Melek Ahmed Paşa li Şengalê komkujî da kirin.
- Di sala 1650`î, bi fermana Mûrad ê 4. Waliyê Wanê Şemsî Paşa li Mûsilê komkujî li Êzidiyan da kirin.
- Di sala 1715`an Waliyê Bexdayê Hasan Paşa li Şengalê komkujî da kirin.
- Di sala 1733`an Waliyê Bexdayê Ahmed Paşa li Şêxanê Êzidî da kuştin.
- di sala 1752`an Waliyê Bexdayê Suleyman Paşa li Şengalê komkujî da kirin.
- Di salên 1732-33`an Nadîr Şah di navbera Surdaş û Kerkûkê de komkujî li Êzidiyan da kirin.
- Di sala 1733`an komkujiyên ku Celîliyan li Êzidiyên li qiraxa çemê Zapê kir.
- Di sala 1735`an bi fermana Nadîr Şah, komkujî li Êzidiyên li Mahabad, Saldûz û Meraxiyê hate kirin.
- Di sala 1742`an, Alî Takî Han ê ser bi Nadîr Şah, komkujî li Êzidiyên li Saldûzê da kirin.
- Di sala 1743`an Nadîr Şah komkujî li Êzidiyên li Kerkûk, Hewlêr û Altûnkopru da kirin.
- Di sala 1743`an Nadîr Şah komkujî li Êzidiyên li qiraxa Zapê da kirin.
- Di sala 1787`an Celîliyan komkujî li Êzidiyên Denanî yên li Şêxanê da kirin.
- Di sala 1798`an Alîkarê Waliyê Bexdayê Abdulazîz bîn Abdullah Beg li Şêxanê komkujî da kirin.
- Navbera aslên 1753-1800`î bi fermana paşayên Osmanî dizî, xerac, kolekirin û komkujî hatin kirin. (6 êrîşên mezin ên li Şengal, Şêxan û Mûsilê)
- Di sala Sala 1809`an komkujiya ku Waliyê Bexdayê Suleyman Paşa li Şengalê da kirin.
- Di sala 1824`an komkujiya ku Waliyê Bexdayê Alî Paşa li Şengalê li Êzidiyan da kirin.
- Di Salên navbera 1832-1834`an komkujiyên ji aliyê Bege Soran Mûhammed Paşa (Mîrê Gewre) ve hatin kirin.
- Di sala 1835`an Waliyê Mûsilê Mûhammed înce Bayraktar li Şengalê komkujî da kirin.
- Di sala 1836`an Reşîd Paşa li Şengalê komkujî da kirin.
- Di sala 1837`an Hafiz Paşa li Şengalê komkujî da kirin.
- Di sala 1844`an komkujiya li Êzidiyên li Botanê hate kirin.
- Di sala 1892`an di encama polîtîkaya Abdulhamît ê 2. de ku bi zorê hewl dida Êzidiyan bike Misilman, komkujî hatin kirin.
- Qirkirineke din a ku di dema nêz de li Kurdên Êzidî hate kirin, di sala 2007’an de bû.
-14’ê Tebaxa 2007’an bi 4 wesayitên bombebarkirî êrîş li gundên siba şêx Xidir û Til Izêr ên Şengalê hatin kirin. Di encamê de 300 sivîlan jiyana xwe ji dest dan.
Li ser vê komkujiyê ti lêpirsîn nehate kirin. Hat ragihandin, ku komkujî ji aliyê rêxistineke çete yha bi navê Ensar El Sune ya ser bi El Qaîdeyê ve hatiye kirin, ku wê demê hewl dida reh berde nava Başûrê Kurdistanê. Lê belê gelek agahî derketin holê, ku li gorî van agahiyan çeteyê Eniya Tikrmen a Iraqê (ITC) jî di nava êrişê de cih girtiye ku ITC ji aliyê îstîxbarata Tirk ve li Başûrê Kurdistanê hatiye avakirin.
Fermana dawî ya herî mezin di 3’ê Tebaxa 2014’an de li Êzidiyan rabû. Kurdên Êzidî bi giranî li navçeya Şêxan a Dihokê, navçeya Şengal a Mûsilê û gundên van navçeyan dijîn. Sala 1975’an ji aliyê rejîma Baasê ve neçarî koçberî û sirgûnê hatin hiştin. Êzidî ji ber fermana her tim xwe li çiyayê Şengalê girtin. Êzidî sala 1975’an bi zorê ji gundên çiyê hatin daxistin û li gundên Xanesor, Til Izêr, Sinûnê, Siba Şêx Xidir, Koço û Dugurê, li 15 gundên quntara çiyê hatin bicihkirin.
Fermana herî mezin a dawî jî di sala 2014’an de li Êzidiyan rabû. Ev baweriya qedîm a Mezopotamyayê di 3’ê Tebaxa 2014’an de bû hedefa çeteyên DAÎŞ’ê.

**Dema fermana 73’an**

Li gorî çavkaniyên xwecihî di dema êrişê de yanî sala 2014’an, 500 hezar mirovî ji Şengalê koç kirine. Li gorî hejmara fermî 360 hezar kes tê îfadekirin. Di roja me ya îro de jî 250 hezar Êzidî, ji derveyî warên xwe li cihên cuda yên Iraqê, Tirkiye, Sûriye û beşek wan jî mehkûmî jiyana li Ewropa hate kirin.
Ne pêkan e ku hejmara mirovên ku di wê demê de jiyana xwe ji dest dane bê zanîn. Lê dîsa li gorî hejmarên fermî ku cenazeyên hatine tezbîtkirin derdorî 1500 re ne. Lê li gorî lêkolînên hatine kirin, tê texmînkirin ku 5 hezar kes di vê êrîşê de ji aliyê DAÎŞ’ê ve hatibin qetilkirin. Li gorî gotinên xelkê herêmê heta niha 87 gorên komî hatine tezbîtkirin, heta niha 36 hatine vekirin.
Tê zanîn ku di wê demê de 7 hezar jin û zarokên Êzidî hatine revandin. Ev ên hatine revandin jî di nav de, tê texmînkirin ku 10 hezar Şengalî hatine revandin. Jin weke amûra cinsî li bazaran hatine firotin, kiryarên der mirovî li ser wan hatine kirin. Her wiha DAÎŞ’ê jin û zarokên revandî bi darê zorê baweriya wan dane guherîn. Zarok piştî hatin ‘misilmankirin’ û şûnde di şerê xwe yê tarî de weke şervan bikar anîne. Navendên baweriya Êzidî hatine îmhakirin.



**Peymana şengalê û gefa êrişên nû**

Daxuyaniyên Wezîrê Derve yê Tirkiyeyê Hakan Fidan ên hefteya borî, xwezayeke hevsengiyan li Şengalê ji bingehê dihejîne. Fidan got: “Piştî Sûriyê dor Iraqê ye. Divê hikumeta Iraqê ji ezmûnên Sûriyê sûd werbigire. Divê li ser hemû axa xwe desthilatdariya xwe deyne. Divê Iraqê biparêze. Piştî Sûriyeyê dor Iraqê ye û em jî diçin wir.” Bi vê yekê Fidan bi awayekî eşkere niyetên Enkarayê yên li ser Iraqê û bi taybetî li ser Şengalê danî ber çavan.
Ev peyv ji eşyariyeke dîplomatîk a asayî pir wêdetir wateyê digirin. Referansa ku Fidan dide “ezmûna Sûriyê”, hewildana meşrûkirina operasyonên leşkerî yên Tirkiyê yên li dijî Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê û wêrankariya ku van operasyonan afirandiye ye. Tirkiyeya ku li Sûriyê bi riya HTŞ û komên din ên çete zevî ji guherîna rejîmê re amade kir û dûv re jî ber bi tasfiyekirina destkeftiyên Kurdan ve meyl kir, niha dixwaze heman modelê li Iraqê bi kar bîne.
Tehdîdên Fidan ne tenê Şengalê, serweriya Iraqê jî rasterast dike hedef. Ew ku wezîrê derve yê welatekî endamê NATOyê bi vî awayî eşkere banga destwerdana nav karên hundirîn ên welatekî cîran bike, wateya binpêkirina prensîbên herî bingehîn ên hiqûqa navdewletî digire. Lê belê ew ku ev binpêkirin ji hêla civaka navdewletî ve bi bêdengî tê pêşwazîkirin, yek ji faktorên herî girîng e ku bêbaweriya Êzidîyan û gelên herêmê kûrtir dike.

**Şengal berxwedanê dike û berxwedan, hebûn bixwe ye**

Tiştên ku li Şengalê diqewimin, nîşan didin ku gel di sînorê herî krîtîk ê têkoşîna hebûnê de ye. Tehdîdên Tirkiyeyê, gavên leşkerî yên Iraqê, bêdengiya civaka navdewletî û bêhesiyariya HHKê, di meylê de ne ku careke din gelê Êzidî bi tenê bihêlin.
Lê belê ji 2014an vir de pir tişt guherîne. Gelê Êzidî êdî organîze ye, xwediyê hêzên xweparastinê ye, îradeya xwe ya siyasî ava kiriye. Avahiyên demokratîk ên ku ji komûnan heya meclîsan dirêj dibin, vegotina somut a mafê gelê xwe yê destnîşankirina çarenûsa xwe ye. Parastina van destkeftiyan, ne tenê ji bo Êzidîyan, lê ji bo hemû gelên bindest ên Rojhilata Navîn çavkaniyeke hêviyê ye.
Çareseriya rastîn ji bo gelekî, ew e ku bi bedel û êşên xwe şîn kiriye û pêş xistiye. Li Şengalê jiyan û berxwedanê bixwe çareserî ji berê ve somut kirine: bi hêzên xweparastinê, bi rastiya xwerêvebirinê, bi aboriya ku hewl dide bi serê xwe bes be û bi îradeya polîtîk-exlaqî ya ku şekil digire. Eger hêzên herêmî û navdewletî dixwazin tevkariya vê çareseriyê bikin, derî vekirî ye. Lê eger bê xwestin ku ne ji çareseriyê re, lê ji êşên nû re derî bê vekirin, bersiva wê yek e: Berxwedan.
Şengal berxwedanê dike û berxwedan, hebûn bi xwe ye.

# Malbatên girtiyan: Em daxwaza zarokên xwe dikin

Malbatên dîlgirtiyan xiyaneta ku li zarokên wan hate kirin şermezar kirin û bang kirin ku çarenûsa zarokên wan bên diyarkirin, ji ber heya niha agahî li ser wan tuneye ku sax in an mirî ne û gotin; "Çavên me li rêya zarokên me yên dîlgirtîn e."

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

**Planên dewletan li ser gelê Kurd bûne bela**

Planên li ser gelê Kurd ên li Rojavayê Kurdistanê bi êrişa li ser Şêxmeqsûd û Eşrefiyê re careke din ket dewrê. Ev êriş bi xwe re gelek êş û azar bi serê xelkên Rojavayê Kurdistanê de anî. Ev plan ji dîrokê heya roja îro de li ser gelê Kurd bûne bela, gelê Kurd jî li hemberî vê belayê tişta di destê wê de ku ew jî têkoşîn, berxwedan, fedekarî, lehengî, parastin, şehîdbûn û serketin, dike.

Di 6'ê Çileya 2026'an komên çeteyên girêdayî dewleta Tirk, çeteyên Colanî û bi mudaxeleya rast rast ji dewleta Tirk, êriş li ser taxên Kurdan ên li bajarê Helebê, Şêxmeqsûd û Eşrefiyê hatin destpêkirin. Piştî berxwedaniyeke bêhempa ji şervanên Kurd li van taxan, şervanan biryara xwe fedakirinê dan û bi wê helwestê têkoşîna xwe raber kirin. Çeteyan piştî taxên Kurdan, dor dan Dêrhafirê, li wir ji bo ku şer bêrfireh nebe û alozî pêk neyê, di navbera Hêza Sûriya Demokratîk QSD'ê û hikumeta Colanî de lihevkirinek pêk hat. Lê hezar mixabin çeteyên HTŞ'ê bi awayek hovane dema vekişîna şervanan de êriş kirin û gelek şervan li Dêrhafir, Reqa, Dêrazorê û Tebqa hatin êsîrkirin û gelek jî bi destê xiyanetê şehîd bûn. Bi taybet eşîrên Ereban ku ewqase sal bi xêra van şervanan di nava aramî û ewlehiyê de jiyan dikirin, lê dema ku çeteyên Colanî berê xwe dan herêmên wan, li pişta şervanan xistin. Lê tu carî hêvî ji van kesan nehatiye kirin, ji ber berê de gelek caran derba xiyanetê li der û dora xwe kirine.

**Azadkirina dîlgirtiyan divê bi awayekî lezgîn pêk bê**

Piştî domandina êriş û şer, bi zexteke mezin a ji berxwedana gelê Kurd li ser navneteweyî agirbest hat ragihandin û lihevkirineke di navbera hêza QSD'ê û hikumetê de pêk hat. Lihevkirin di 29'Çileyê de hat îmzekirin û di 30 Çileyê de hat ragihandin, ev lihevkirin li ser bingeha ku çareserî bi diyalogê ne bi şer û rijandina xwînê ye. Herwiha lihevkirin rêgirtina li ber windahiyên mezin bû. Di nava vê peymanê de gelek bend hebû, hemû jî bingehên wan parastin û misogerkirina herêmên Kurdan û xweseriya wê, di nav de jî yên pêkhateyên din. Lê tevî ku peymana 29'ê Çileyê di 2'ê Sibatê de ket meriyetê, ji wê demê heya niha xala ku divyabû berî her tiştî pêk bihat xala "Dayîna cenazeyên şehîdan û azadkirin dîlgirtiyan bû", lê hikumet di pêkanina van bendan dereng dixê, wekî ku çawa dorpêça li ser Kobanê jî dewam dike. Heta niha jî, hejmara rastîn a şervanên ku hatine girtin û winda bûne bi awayekî fermî nehatîye eşkerekirin. Hin jî dîlgirtiyan jî ji şerê Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî windane û heya niha tu agahî ji wan nehatiye, lewra malbatên wan banga her kesî dikin ku vê bêdengiyê bişkînin û çarenûsa zarokên wan were diyarkirin.

Di vê çarçoveyê de malbatên girtiyan ji Rojnameya me re axivîn û daxwaze diyarkirina çarenûsa zarokên xwe û radestkirina cenazeyên şehîdan kirin.



**Ebdulkerîm Osman**



**Mewlûda Iskan**



**Îlham Şêxmûs**

**'Heta kengî wê zarokên me winda bihêlin'**

Ebdulkerîm Osman bavê dîlgirtiyê bi navê Azad ku ew 7 sal in agahî jê tune ye diyar kir ku ew dixwaze nas bike kurê wî çi pê hatiye û wiha got: "Di şerê Serêkaniyê de li ser rê kurê min bi hevalê xwe re hatin girtin û ketin destê Hatim Ebû Şeqra de. Hatim niha di nava vê hikumetê de cihê xwe digre û wî kirine cihê biryarê jî, tevî ku destê wî di şehîdxistina Hevrîn Xelef de û gelek sûcên din de jî heye. Kurê min bi şehîd Hevrîn Xelef a ku her kes çîroka wê nas dike, re bû. Ji dema ku ew hatiye girtin û heya niha çarenûsa wî nediyare ku ev 7 salên wî diqedin. Em daxwaza zarokê xwe dikin ku rewşa wan bidin diyarkirin. Ev kes mislimantî, irf û edet li gel wan nemaye. Ehmed El-Şara dibêje pevguhertina dîlgirtiyan, ka heya niha yek dîlgirtiyên me derneketine. Heta kengî wê van zarokên me winda bihêlin. Radin behsa mislimantiyê dikin dibêjin rojiya Remezanê, ew rojiya çi digirin, eger zarokên ji kezeba dê û bavan re nade xuyakirin jiyan dikin an na."

**'Zarok hîna bavê xwe nedîtiye, ji ber bav dîlgirtiye'**

Ebdulkerîm Osman axaftina xwe wiha qedand: "Banga min ji dewletên cîhanê û neteweyên yekbûyî hemû re ku xwedî li van dîlgirtiyan derkevin û zextê bikin ku rewşa zarokên me bên diyarkirin. Kurê min niha xwedî zaroke, lê zaroka xwe ya dawî nedîtiye ji ber berî ku zaroka wî çavê xwe li dinyayê veke ew hat girtin. Hêvî dikim zaroka wî bavê xwe bibîne û êşa me bidawî bibe."

**'Çavên dayik, bav, hevjîn û zarokan li rêya dîlgirtiyan e'**

Mewlûda Iskan bi çavên tijî rondik û dilek şikestî anî ziman ku ev zêdeyî 40 rojî kurê wê dîlgirtî ye û wiha got: "Kurê min ev zêdeyî 40 rojin ji aliyê çeteyên Colanî ve hatiye girtin, em tiştekî li ser nizanin lê tenê em dizanin li Reqayê hate girtin. Daxwaza min jî ku em bizanin kurê min li ku ye û zarokê me berdin. Kurê min sê zarokên wî hene, çavên wan her li rêya bavê wan e. Bi hêvîne di zûtirîn dem de agahî ji zarokên me bên û serbest bên berdan."

**'Xiyanetî li kurê min û hevalên wî hatin kirin'**

Îlham Şêxmûs dayika ku hîna birîna wê ya li ser kurê wî şehîd nehatiye kewandin, niha jî êşa kurê xwe yê girtî jî dikşîne. Ilham Şêxmûs diyar kir ku xayîntî li kurê wê û hevalên wî di dema vekişînê de hat kirin û wiha bilêv kir: "Beriya 3 mehan kurê min şehîd bibû, niha jî di dema êrişên li ser herêma me li Dêrhafir kurê min bi xiyanetê hat dîlgirtin. Lewma daxwaza min ewe ku êsîrên me xuya bikin, da ku em zanibin girtîne yan mirîne, li ku bin em dixwazin nas bikin ji bo em rehet bibin, ger êsîr bin em zanibin êsîrin û şehîd ketibin em razîne. Ji ber di karên wan de her tiştê wisa li pêşiya wan bû. Lê armanca wan ewbû ku parastina welatên xwe bikin. Em bi hêvîne aramî pêk bê û ev hemû bidawî bibe, êdî em westiya ji bendemayênê, ev 15 sal em di vê rewşê de ne, lê sînorek ji sebrê re heye."

**'Em bi şervanên xwe serbilindin û bi şehîdên xwe mezin in'**

Îlham Şêxmûs axaftina xwe wiha bidawî kir: "Layê min yê dîlgirtî niha, dema ku çû şer pir kêfxweşbû û digot em ê biser bikevin, îro roj roja şêra ye, heger îro nerim parastina cih û ware xwe nekim, gelo kengî her im. Em ewqase sal berxwedanê dikin ji bo rojeke weke îro ku em têkoşînê bikin. Dîsa jî em bi xêra şervan û şehîdên me, em heya niha di ewlehî û aramiyê de ne. Em bi hemû şervanan serbilindin. Asta em gihanê bi keda û xwîna şehîdên me ye"



## Şerê Rojhilata Navîn

**Farûk Sakik**

Şer dest pê kir. Di destpêkê de em navê vî şerî zelal bikin. Ev şer ne bi tenê şerê Îran-Amerîka-Îsraîlê ye. Navê vî şerî, şerê Rojhilata Navîn e. Li nexşeya şer binêrin, li herêmê, her dewlet û hêz di vî şerî de ne. Balafir û fuze li ser her welatî diçin û tên. Moşekên Îranê ber bi her dewletî ve diçin. Li ku derê bargeheke Amerîkayê ya eskerî hebe, moşek û fuzeyên Îranê berê xwe didin wêderê. Di şeva 1'ê Adarê de, hêzên Îranê bi diron û muşekan êrişî navend û bargehên partiyên Rojhilatê Kurdistanê jî kir. Ji gelek navendan ber bi Îranê jî gelek balafir û fuze bi rê ketin. Ji Îsraîlê, ji hemû welatên Ereban, ji Qibris û yekjî ji li Tirkiyê li bajarê Konya bi rê ket. Balafira ji Tirkiyê rabû, balefira bi nave AWACS a îstixbaratê bû.

Em ê di vî şerê de nav û hejmara kesên hatinin kuştin nedin. Hemû alî vê hejmarê li gor xwe bikartînin. Amerîka û Îsraîl çi armanc kirine nayê zanîn. Ji bilî daxwazên ku di pêvajoya muzekereyan de ji hev dixwestin, anha dixwazin li Îranê rejim were guhertin. Û ew rejîm hatî ruxandin. Ev kabîneya nû ne xwedî hêzeke. Bi tenê ji bo valahiyek were dagirkirin hatî avakirin. Ewlekariya wan, ji yên hatine kuştin bi ewletir nine. Amerîka bixwaze îroj dikare wan jî bike armanc.

Rejima Îranê li hember dengê kolanan komkujiyên mezin pêk anîn. Hejmara kesên hatine kuştin bi deh hezaran têne pênasekirin. Bi hezaran kes jî hatine girtin. Li gel ev hemu zext û komkujiyan gel ji kolanan venekşiyan, dev ji îdîaya xwe ya azadî û demokrasiyê bernedan.

Îran, di hundir de veguherandinek jiyan nekir, vê yekê ew ji êrîşên derve re vekirî hîşt, kire hedefa van êrîşan, li aliyê din jî di nava gelên Îranê de jî meşruiyeta xwe wenda kir.

Berî ku şer destpêbike ev deng hişyariyek bû ku demokrasî û azadî were vê axê. Daxwazên gelan bersiv bibinîn. Mixabin ev yek nekirin û bedelê giran jî dan.

Di nav van gelên li Îranê dijîn em behsa Kurdan bikin. 5 partiyên Kurdan hatin cemhev û fotografek parvekirin. Bilî vê tu tiştek nekirin. Dikaribûn sekreteriyek were avakirin. Ji gel çi dixwesttin? Gel çawa tevbigere? ev yek nehat destnîşankirin. Diviya heroj gel ji aliyê wan ve bihata agahdarkirin.

Di vî şerî de helwestek çawa bigirin. Li vêder xeta sêyem a ku behs dikin li gor vî şerî û li gor vî zemanî, derbasdar nine. Di vî şerî de xet nine stratejî heye.

Rêber Apo ev stratejî bi du hevoka destnîşan kiriye:" Ez dixwazim vê ji PJAKê re bêjim: Ger bingehek ji bo danûstandinan bi Îranê re hebe, divê ew diyalogê pêş bixin. Lê ger înkar û wêrankirin û pêşxistina dijminatiyê berdewam bike, divê ew parastina xwe bikin"

Ev gotin bi tenê ji bo PJAK'ê nîne. Ev di heman demê de ji bo Kurdan stratejiya şer e.

Bi Amerîka-Îsraîl re helwestek çawa hebe? Dive ne li kêleka wan û nejî li dijî wan siyasetek me tunebe. Ev şer, ne şerê me ye!!

Li Îranî wê sîstem were guhertin û desthilatdariyek nû were avakirin. Kurd ji anha de bi vê desthilatdariya nû re wê siyasetek çawa bimeşîne li du vê yekê bikeve. Gel xwe ji bo wê rojên zehmet jî amade bike. Ew 5 partiyên hatinin cemhev û eniyek ava kirine, mîsyona wan, ji bo stratejiya nû, gel ji îhtimalên êrişên dijwar biparêze ji anhada tedbîran bigire.



# Ji çiraxên hunera Kurdî

**Can Yûsiv**

Hunermendê Şivan Cezîrî çemek ji awazan û buxçek ji helbestan ku kulîlkên wê naçilmisin. Wî ji bo welat, ji bo gel, jinan, evînê û ji bo şoreşê stran gotin, lewra dengê wî di navbera nifşan de bû pirek û bîranînek ku serê sibê di dilê evîndarên wî de geş dibe.

Hunermend û stranbêjên Kurd ên hemdem roleke girîng lîstine di parastina mîrata çandî û nasnameya neteweyî de, ziman û nirxên resen ên kurdî ji winda bûn û ji bîrçûnê parastin e, wan awaz û stranên xwe kirin mîna çiraxan ronahî rêyên gelê xwe ronî kirin û bi dengên xwe, wan pirên wijdanê afirandin, û hunera xwe veguhêrandin neynikek ku êş û hêviyên miletê kurd nîşan dide.

Di nav wan de navê hunermendê Şivan Cezîrî di çirise û nîşaneke ronahî di dîmena muzîkî û stranbêjiyê de hişt, heta ku awazên wî bûne alayek di livlive û ji bo nasname, hest û welatparêzî dijene.

Hunermend Şivan Cezîrî di sala 1979'an de, ji dayîk û bavek Kurd (Şukrî û Rimziya), li gundê Hemze Begê ku pala xwe dide Çiyayê Qereçoxê li gundewarê Dêrikê ya Rojavayê Kurdistanê, hatiye dinyayê.

Ew gund ne tenê xalek li ser nexşeyê bû, lê bîranînek zindî bû ku bêhna axa Kurdistanê jê dibare û her sibe bi ronahiya rojê ya ku ji lûtkeyên Qereçoxê dadikeve, ew dixemile.

Serê sibehan geş dibe bi awazên zirneya Yûsif Misêlîx ku deng vedide li asoyê mîna nimêjên muzîkê û bi awazên Mela Xelîl ku di giyanan de mîna kaniyek zuha nabe diherikin û nalînên Silo Koro ku ji eywanên xaniyên xwelî( herî) dadikevin xwarê, şevê tije dikin bi xemgînîyek kûr û hesretek ku venamire.

Herwiha Dêrik, bajarê dayikê, bi bîrdanka xwe ya dewlemend û cihêrengiya xwe ya bedew ew hembêz kir, ew bajar ji dema berê de û hîn jî li ber awazên zirneya Ehmed Elanê û stranên Ebdo Elanê û dengê saza Cemal Sadûn şiyar dibe.

Ew di kûrahiya singa xwe de sira hunerê hildigire û dergehên xwe ji bo helbestvan û dengbêjan, ji bo nivîskar û şoreşgeran vedike, heya ku bûye neynika cihêrengiya ol û şaristaniyan hem jî ronahiyek ku bîrdankê diparêze û riyan ronî dike. Şivan di himbêza malbateke Kurd a kedkar û xwedî nirxên resen de, ku ji heşt bira û çar xwîşkan pêktê, mezin bûye, di maleke nefsbiçûk de ku ji hezkirin û rûmetê tije bû, li wir, dê û bav di dilê zarokên xwe de wefadariya ji bo xakê, dilsoziya ji bo welat û hesreta azadî û rûmetê di çandin.

Şivan ji zarokatiya xwe ve guhê xwe dida çîrokên dapîran ku di şevên sar ên zivistanê de dihatin hûnandin û guhdar dikir li sirûdên jinan ên ku ristin bi hesret û êş re tevlihev dikirin û li stranên cotkaran ên ku bi dengê tevir û tefşoyan bi kolana axê re bilind dibûn guhdarî dikir, ev deng û awaz tevlihev bûn pê wijdanê wî yê hunerî afirandin û ruhê wî yê neteweperestî xurt kirin. Wî zarokatiya xwe li kolanên teng ên Dêrikê derbas kir, di navbera kavilên qijleya leşkerî ya Fransa de, ku di bîranîna wî de bû sembola berxwedanê, û zengilê Dêra Meryem, ku di wijdana wî de wek sirûda aşitiyê ya bêdawî lê dixist, û kaniya leşkerî, ku dengê xumxuma ava wê, guh û xeyalên wî hênik dikirin,

Li wê derê, di bin siya dêliyên rezên tirî ên daketî û darên hêjîrê û tûyan ên mêwedar, xunceyên yekem ên xewnên wî şîn bûn û ew fêr bû ji serpêhatiya hunermendên mezin ên Dêrikê ku dibistaneke hunerî ya resen ava kirbûn, wek (Cemal Sadûn, Elî Gavan, Ebdo Elanê, Mihemed Teyib Tehîr) ew bûn hêmanên bingehîn ên kariyera wî, Dêrik dibistana wî ya yekem bû û dergehê wî yê fireh bû ji bo cîhana hunerê.

Bi vî awayî, kolan, dêr, kanî, rezên tirî û dengê hunermendan di wijdanê wî de tevlîhev dibûn, ku axeke bi bereket afirandin ku wî helbestên xwe yên pêşîn tê de çandine û ji xêzên wê awazên ku bi berdewamî şop û giyana ronak ya Dêrikê hildigirin vedihûne. Berhema wî ya hunerî mîrasek zindî ya bîranîna Dêrikê bû, û dengvedanek nûvejen bû ku nifşan derbas dike û hestek kûr a xwedîtiyê û nasname yê dide wan.

Hunermend Şivan Cezîrî dibistana seretayî heta pola sêyemîn li gundê xwe "Hemze Begê" xwend. Paşê malbata wî koçî bajarê Dêrikê dibe, li wir xwendina xwe ya seretayî û amadehî li dibistanên bajêr di qedandiye, li wir zanyariyên bingehîn bi dest xistiye û yekem jîrektiyên xwe yên perwerdehiyê ava kiriye, rêwîtiya xwe ya di nav pirtûkan û hezkirina zanist û fêrbûnê de berdewam dike.

Meyla wî ya hunerî û hezkirina wî ji mûzîk û stranbêjiya kurdî re di temenekî biçûk de dest pê kiriye û di bin bandora dibistana "Seîd Yûsif û Elî Gavan" de bûye, lewra jêhatîbûn û afirîneriya xwe ya hunerî ji wan girtiye, û destpêka wî wek lêderê rîtmê (derbekê) dest bi kar kir bi hunermendên Dêrikê re wek: (Cemal Sadûn, Elî Gavan, Ehmed Cizîrî, Elî Ebdo Elanê, Ridwan Dêrikî, herwiha Koma Cûdî û Azadî û yên din re).

Dûv re wî dev ji lêxistina rîtmê berda û dest bi jenandina tembûrê kir, berî ku bibe awazdêner û stranbêj, wî bi deng û awazên xwe, rêyeke hunerî ya yekgirtî û tekûzkirî afirandine, ku dewlemend bû bi ezmûn û jêhatîbûnê , heya ku bû yek ji dengên taybet û cudakar di dîmena mûzîka kurdî de.

Hunermend Şivan Cezîrî di sala 1993'an de dest bi karê xwe yê hunerî weke mûzîkjen û stranbêj kir û li gel hunermend û komên navdar beşdarî vejînkirina konsert û dawetan li bajar û deverên cuda yên Rojavayê Kurdistanê bû.

Piştî vê yekê, wî çalakiyên xwe yên hunerî di Efrînê de berdewam kir; bi dirêjahiya 12 salan ji 1995'an heya 2007'an bi vejînkirina dawetên gelêrî û konsertan de li gel komek hunermendên herêmê yên navdar wek: (Şehrîban Efrînî, Ekaş Dildar, Ebdo Mihemed, Xebat Tefûr, Amer Ebû Nûr, Redwan Doxan, Resûl Berazî...), vê yekê bandoreke kûr li ser bîra gelê herêmê û dîmena wê ya hunerî hişt.

Wî ji bo welat, ji bo gel, jinan, evînê û ji bo şoreşê stran gotin, lewra dengê wî di navbera nifşan de bû pirek û bîranînek ku serê sibê di dilê evîndarên wî de geş dibe.

Çalakî û jêhatîbûna wî tenê bi dengbêjî û sazevaniyê re sînordar nema, belê pênûs û awazên wî mîna çemekî di nava xakê û dilan de diherikîn.

Di heyama kariyera xwe ya hunerî de di navbera salên (1999-2004) pênc albûmên cihêreng weşand, ku di wan de stranên welatparêzî, hestyarî û romantîk tevlihev bûn û di her albûmekî de çîrokek û awazek ku riyan ronî dike hildigire.

- Albûma yekem: "Min Dilê Xwe Da Te" (1999)
- Albûma duyem: "Lo Şivano" (2001)
- Albûma sêyem: "Ji Bîr Bibî " (2002)
- Albûma çarem: "Dîlanek Xweş Digerî" (2003)
- Albûma pêncem: "Hela Meryem" bi hevbeş bi hunermend Xalîd Şêxo re (2004).

Gelek hunermend û komên kurdî ji çavkaniya wî vexwartin, awaz û stranên wî bûne ronahiyek ku nifşan jê îlham girt û qad jî dewlemend kir.

Ji nav stranên wî yên herî navdar ku ji awaz û peyvên wî ku hunermendan gotine :

- Wahîd Murad: (Dişewtim Bi Agirê Te)
- Mezlûm Efrînî: (Gerîla)
- Şêrzad Haco: (Heger Tu Pûşmanî)
- Şehrîban Efrînî û Zubêr Salih: (Wek Herçar Demê Salê)
- Azad Feqe: (Gundê Min Çend Şêrîn e)
- Delîl Silêman: (Hij Te Dikim)
- Xalîd Şêxo: (Hey Meyremê)
- Ehmed Koçer: (Şengal)
- Hesen Qasim: (Yekîtî)
- Hemûdê Axîn: (Xeberek Ji min ra Hatî)



Herwiha hin komên hunerî jî stranên wî yên ji awaz û peyvên wî gotine, mîna:

- Koma Cûdî:
  1- Êrîşên Xedar
  2- Destar Dîsa Geriya
  3- 11 Lehengîn Qereçoxê
  4- Şivan Li Bilûrê Dêxîne
- Koma Elîftîriya:
  1- Xeml û Xêza Kurdî
  2- Newroz
- Koma Kolîlkên Kurdistanê:
  1- Pîrê Bangker
  2- Zimanê Min Zêrîne
  3- Serokatî
  4- Pirpirîkê.

Şivan bi van stranan tekez kir ku awaz û gotin dikarin nasnameyê biparêzin û dilan geş bikin.

Di sala 2020'an de ew tevlî Koma Cûdî bû da ku huner û dengê xwe bêxe di bin xizmeta doza xwe û gelê xwe de û bi wan re beşdarî vejandina gelek konsertên hunerî çalakiyên neteweyî û cejnên Newrozê li Dêrikê, Girkê Legê, Rimêlan û Qamişloyê bû.

Herwiha ew bi deng û saza xwe beşdarî tomarkirina bi dehan stranên şoreşgerî û welatparêzî û videoklipên stranbêjiyê bû ku bi awaz û gotinên xwe pirtûkxaneya hunerî ya kurdî dewlemend kir, yên herî navdar ji van stranan:

1- Ebdîşo
2- Gûrzê Gerîla
3- 11 Lehengên Qereçox
4- Şivan Li Belûrê Dêxîne
5- Jîna Emînî
6- Serokatî

Hunermend Şivan Cezîrî şeş salan di rêxistinên ACTED û Harîkar li Başûrê Kurdistanê xebitî û hewl da ku zarokan fêrî lêxistina amûrên mûzîkê û stranan bike û hezkirina hunerê û ruhê afirîneriyê di dilê wan de biçîne.

Herwiha hunermend Şivan salekî jî di Radyoya Dicleyê de xebitî weke amadekarê bernameya bi navê "Huner û Jiyan" û di wê bernameyê de bi hunermend û helbestvanan re hevpeyivînên girîng pêşkêş kir û serpêhatî û afrîneriyên wan ronî kir û dengê hunerê nêzîkî dilê guhdaran kir.

Hunermend Şivan Cezîrî ne tenê hunermend û bestekar e, lê ew çavkaniyek ji dayîn û afirîneriya ku tucaran zuha nabe û heta niha jî ew endamekî çalak ê "koma Cûdî" ye, ku bi hemû zindîtî û hewesa xwe hunera xwe pêşkêş dike, ew hîn di bilindahiya bexşîn û afirîneriya xwe ya hunerî de ye,

Ew stranan dinivîse, distirê, li sazê dêxe û awazan çêdike, bê west û rawestandin peyamên hunerî, çand û neteweperweriyê hildigire, rêwîtiyeke tije bi awaz û bedewiyê pêktîne ku pirtûkxaneya hunerî ya kurdî dewlemend dike û îlhamê dide nifşan.

Ez di karîyera wî ya hunerî de serkeftin, afirînerî û ronahiyek mayînde dixwazim.

# 'Bi awayekî rêxistinî û rojane nan dighêje gel'

Hevserokê Komîteya Firneyan ya kantona Cizîrê Rondar Salih tekez kir ku pirsgirêkên nan bi giştî hatiye çareserkirin û bi awayekî rojane nan dighêje milet û got, "Rojane gerên şopandinê li ser nangehan pêktên. Kalîte, giraniya nan û cudahiya wê tê şopandin, da ku em karibin nanekî baş li gorî pîvanên ku tê xwestin, bigînin milet."

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

Hemû nangehên li ser asta kantona Cizîrê bi tevahî bajar û bajarokê wê kar û xebatên xwe di meha Remezanê de berdewam dikin. Di heman demê de Komîteya Firneyan li gorî pilanên ku armanc jê xizmeta gel di dabînkirina madeya nan bi awayekî rêxistinî û kalîteya ku tê xwsetin bikin; kar û xebatên xwe didomîne.

Derbarê kar û xebatên Komîteya Firneyan û mekenîzmeya xebitandina nangehan li hemû bajarên kantona Cizîrê Hevserokê komîteya Firneyan ya girêdayî Meclisa Aborî û Çandiniyê ya kantona Cizîrê Rondar Salih ji rojnameya me re axivî.

**'Rojane şopandina meydanî ji bo nangehan tê kirin'**

Hevserokê Komîteya Firneyan ya girêdayî Meclisa Aborî û Çandiniyê ya kantona Cizîrê Rondar Salih tekez kir ku ew şopandinên meydanî bi rojane li ser nangehan pêk tînin û wiha anî ziman: "Komîteya Firneyan bi hemû endamên xwe li tevahî bajar û bajarokên kantonê rojane gerên meydanî li ser firneyên giştî û teybet pêk tînin, bi armanca şopandina rastiya kar, xebatên nangehan, çêkirina nan ji hemû aliyan ve ji dema ard destpê dike, dema dibe hevîr û di dawî de dibe nan di heman demê de çavdêriya kalîte, giraniya nan û cudahiya wê tê kirin. Ji xwe dema ku ard ne li gorî pîvanên ku tê xwestin tê vegerandin. Yanî bi renegekî giştî nangeh tên şopandin da ku bi awayekî baş bighêje ber destê gel. Giraniya nan kîlok û 100gram e, her kîsek 9 nan tê de hene û bi nirxê 3 hezar L.S dighêje welatiyan. Di gerên me de ji bo nangehan kêmasî, zehmetî û derbaskirin jî derdikevin, di wir de weke komîte em tedbîrên xwe digrin, eger tu derbaskirin derbikeve em di destpêkê de hişyariyê didin an jî ceza tê dayîn dema ku kêmasî bê tesbît kirin."

**'Komîte erkê xwe yê xizmetguzarî di meha Remzanê de pêk tîne'**

Rondar Salih diyar kir ku ew erkên xwe yên xizmetguzarî bi ruhekî berpirsyartî bi cih tînin û wiha berdewam kir: "Di meha Remezanê de wekî berê kar û xebatên nangehan berdewan dike û nangeh bi giştî di xebitandinê de ne. Li gorî daxwaz û xwestekên milet me mekenîzmeya seata belavkirinê guherand da ku berî dema fitarê bighêje milet, em nan li komînan belav dikin û ew ji hêla xwe ve dighînin milet ji bo ku bi awayekî rêxistinî proseya belavkirinê bê kirin. Ev pêşîniyar me kir weke biryar piştî ku hat nîqaş kirin herwiha biryar li ser nangehên giştî û taybet hat feriz kirin, di encamê de milet ji vê biryarê rehet û kêfxweşbû."

**'Nan bê dirav dighêje koçberan'**

Rondar Salih behsa destpêka êrişên vê dawiyê kir û astengiyên ku li hember wan derket û wiha got: "Ji xwe dema ku êriş li ser herêmên me pêk hat, hejmara koçberan di nava bajarên me de zêde bû, em neçar man ku mîqdara ard li ser nangehan li hemû bajaran li gorî daxwaza wan zêde bikin da ku nan bighêje hemû welatiyan di nav de koçberan jî. Nanê ku dighêhe koçberan bê dirav tê belavkirin û nangeh ji wan re hatin e diyar kirin ji bo ew jî nekevin astengî û zehmetiyan.

Gelek astengî bi me re derbas bûn û zehemetî jî me kişandin dema ku bi hejmareke mezin koçber derbasî bajarên kantona Cizîrê bûn, hinek alozî çêbûn hem li ber deriyê nangehan an jî di hundirê wan de hem di komînan de, di encamê de Komîteya Firneyan komîteyên awarte li hemû bajar û bajarokan ava kirin. Ev komîteyên awarte bi taybet ji bo şopandin û çavdêriya kar û xebatên nangehan hatin avakirin, bi seat û deqeyan têkilî bi me re dikirin herwiha komîteyek jî li ser asta kantona Cizîrê hat ava kirin û rojane xwestek, pêşînyar û pirsgirêkên ku bi wan re derdiket bi hevsengî dihatin çareserkirin."

**'Hemû warên girêdayî nan û nagehan tê şopandin'**

Rondar Salih tekez dike ku Komîteya Firneyan ji bo bi cih anîna erkên xizmetguzarî di kar û xebatên xwe de berdewam e û wiha got: "Erka me çêkirin û peydakirina nan li gorî pîvanên ku tê xwestin ji bo welatiyan e, rojane em nan li ser hemû komînên bajar û bajarokên kantona Cizîrê belav dikin. Nan ji nangehê derdikeve û dighêje belavkerê fermî yên nan, ji xwe belavkerê nan ji komînê hatiye pêşîniyar kirin û komîn berpirsyartiya belavkerê nan radike. Eger belavkerê nan bi erk xwe bi cih neyne ev dikeve



berpirsyartiya hevserokên komînê. Bi giştî hemû aliyên girêdayî nan û nagehan tê şopandin.

Hevserokê komîteya Firneyan ya girêdayî Meclisa Aborî û Çandiniyê ya kantona Cizîrê Rondar Salih wiha gotina xwe qedand: "Deriyê Komîteya Firneyan ji bo gazin, gilî û pêşîniyarên milet vekiriye, da ku zehemtiyên ku li hember wan derdikeve û dikşênin çareser bikin çi girêdayî belavkirin an kalîteya nan be. Erkê me yê sereke dabînkirina nan bi awayekî baş ji bo welatiya ne. Ji erkê me yê exlaqî û wijdanî ye ku em xizmetkarê gelê xwe bin, bi taybet di vê qonaxa ku tê de derbas dibin. Em bi hêvîne ku miletê me bi me re alîkar be da ku bi hev re pirsgirêkên wan çareser bikin û nehêlin derbaskirin çêbibin. Gazin tiştekî sereke ye û şopandina milet jî ji me re pêwîste, ji ber ku çiqas komîteyên me hebin dibe ku têrê neke lewma şopandina gel pir giringe.

# Li kantona Cizîrê serjmariya sewaladariyê berdewam dike

**Jîn Hisên/Qamişlo**

**Komîteya Sewaldariyê ya girêdayî Meclisa Aborî û Çandiniyê ya kantona Cizîrê ji ber rewşa ewlehiyê xebata serjimariya sewalan rawestandibû û da ku li deverên mayî temam bike, ji nû ve dest pê dike.**



Kar û xebatên serjimariya Sewaldariyê ku Desteya Sewaladariyê li herêma Cizîrê di 27'ê Mijdarê de destpê kiribû ji ber rewşa ewlehiyê ku herêmê tê re derbas bû rawestandibû. Herwiha ji bo temamkirina serjimariyê li derverên din, ji nû ve komîteya sewaldariyê dest bi serjmariyê dike. Armanca vê serjimariyê belegekirina hejamara giştî sewalên li herêmê ye.

Ev lêkolîna berfireh beşek ji planeke berfireh e ji bo amadekirina datayeke dîjîtal ku dê alîkariya beşê aborî bike di pêşxistina bernameyên rast de ji bo peydakirina xwarin û dermanê sewalan herwiha dê piştgiriya sektora Sewaldariyê bike.

Di heman demê de li gel ji nû ve destpêkirina serjmariyê, beşê Sewaldariyê êmên ajalan li gorî encamên nûjen û serjmariya nû belav dike. Beşa Sewldariyê bi rêjeya 18 kîlogram ji bo her seriyek ji ajalên biçûk û 180 kîlogram ji bo her ajalên mezin diyar kiriye. Ev gav bi armanca piştgiriya xwediyên ajalan tê avêtin herwiha misogerkirina belavkirineke dadmend li gorî hejmarên rastîn yê Sewladariyê.

**Nêzîkî ji sedî 80 serjmarî qediya ye**

Komîteyên Sewaldariyê yên girêdayî Meclisa Aborî û Çandiniyê ya kantona Cizîrê, piştî ku ji ber şert û mercên ewlehiyê xebat rawestandibû û niha ji nû ve dest bi serjmariya ajalan kirin e da ku deverên mayî temam bikin.

Nêzî ji sedî 80 ji tevahiya projeya serjmariyê bi beşdarbûna 32 komîteyên meydanî hatiye temamkirin.

Bi başbûna şert û mercên ewlehiyê, komîteyên peywendîdar ji nû ve dest bi xebatên serjimêriyê kirin da ku daneyên mayî temam bikin, ji ber ku hin herêmên xebatên serjmariyê lê nehatibû temamkirin weke bajarê Til Temir, Dêrik û Hesekê.

**Mekenîzmeya belavkirina êmên ajalan li gorî serjmariya nû:**

Di heman dema destpêkirina serjmariyê, aliyên peywendîdar dest bi belavkirina êmê sewalan li gorî daneyên nû kirine. Ev belavkirin li gorî van rêjeyan hat kirin:
Ajalên biçûk: 18 kîlogram ji bo her seriyekî ji bedêla 10 kîlogram
Ajalên mezin: 180 kîlogram ji bo her seriyekî ji bedêla 50 kîlogram

**Ji bo piştgiriyeke dadmend**

Di çarçoveya piştgiriya xwediyên ajalan û pêkanîna belavkirina dadmend li gorî hejmarên rastî yên Sewaldariyê, ev gav hat avêtin. Li gorî Nivîsgeha raghandina Meclisa Aborî û Çandiniyê ya kantona Cizîrê, beşa Sewaldariyê tekez dike ku proseya belavkirina êmên ajalan dê li gorî pernesîb û pîvanên pejirandî û encamên serjmariya nû, bê kirin. Di heman demê de li ser girîngiya hevkariya xwediyên ajalan bi komîteya serjimariyê re û pêşkêşkirina agahiyên rast ji bo misogerkriina serkeftina vê proseyê û pêkanîna dadmendiyê di qûnaxa belavkirinê de, hat destnîşan kirin. Temamkirina serjmariyê wekî gaveke sereke ji bo rêxistinkirina sektora sewaldariyê û xurtkirina aramiya wê ye, ku dê bandoreke erênî li ser rastiya çandinî û aborî li tevahiya kantona Cizîrê bike.



# 'Divê Kurdên Rojhilat derfeta serxwebûnê ji dest nebin'

Endamê Meclisa PYD a bajarê Qamişlo Ebdulhelîm Iko diyar kir ku dîzayînkirina cîhanê careke din bi rêya Îsraîl Amerîka û bi serkêşiya Birîtanyayê tê kirin ku ew dixwazin li gorî berjewendiyên xwe dostên nû li herêmê çêbikin, hin rejîman tunebikin, welatan feqîr û bêbandor bikin û got, "Gelê Kurd jî divê ji rewşê sûdê werbigre û derfeta serxwebûnê ji dest nebin."

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

Derbarê şerê ku niha li Rojhilatê Kurdistan û Îran rû dide, herwiha rewşa Kurdan li wir, endamê Meclisa Partiya Yekîtiya Demokrat (PYD) a bajarê Qamişlo Ebdulhelîm Iko bersivê pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**Geşedanên niha ku li Rojhilatê Kurdistanê û Îranê piştî xwepêşandanên girseyî yên gel tên qewamandin, tên çi wateyê?**

Bûyerên li Îranê diqewimin, bi taybetî zêdeyî 40–50 sal in ku ji dema hatina rejîma xumêniya dest pê kir. Ew rejîm di wê demê de bi zanebûn hat ser desthilatdariyê. Dewletên hegemon ên modernîta kapîtalîst ew rewş amade kirin, da ku rejîmek faşîst li ser desthilatdariyê were danîn û rejîma berê were rakirin. Ev jî beşek ji planên dewletên mezin bû, ew dewletên ku ji bo berjewendiyên xwe dixwazin herêmê bixin bin bandor xwe, ku bikaribin serweriya xwe li ser cîhanê fireh bikin. Ji ber vê yekê, gelek caran qedera milet di destê dewletên hegemon de dimîne. Mînak, çawa Soviyêt ji hev ket û paşê Rûsiya jî di nav guhertinên mezin de ma.

Eynî van dewletên ku rejîm anî ji bo ku dîsa têxin bin destê xwe û zextê li ser dewletên Rojhilata Navîn bikin, dewletên Kendava Erebî û dewletên herêmê jî ji bo ku her dem serweriya cîhanê ya dewletên mezin wek Amerîka, Yekîtiya Ewropa (YE) û Îsraîlê biparêzin. Wana dixwest van welatan bixin bin kontrola xwe, da ku rê nedin Rûsya, Sîn û Koreya Bakur ên ku li dijî siyasetên wan in û naxwazin aboriya cîhanê bikeve destê wan.

Ev jî planek bû, wan rejîm anî û ji bo wan demekê kar û xebat kir. Lê piştî ku ew rejîm nema bi kêrî wan tê û berjewendiyên wan pê re diqedin, wek rejîma Îranê ya Xumeynî û paşê yên din ên ku hatin kuştin, nema berjewendiyên wan dewletan diparêzin. Lewra niha jî dixwazin ji wan xelas bibin. Ji ber niha projeyek li cem wan heye, ew jî wêne û nexşeyên nû ne ku di herêmê de dê bêne çêkirin.

**Êrişên ku li ser Îranê pêk tên armacên wan çi ne û divê gel Kurd li Rojhilatê Kurdistanê di warê siyasî û leşkerî de çawa tevbigrin?**

Dîzaynkirina cîhanê careke din di rêya Îsraîl û rismê wê de tê kirin, Birîtanya ev projeyê danî, Amerîka jî alîkariya wê dike. Ev her sê hêz dixwazin ew guhertinên ku berê di herêmê de kirine, dîsa li gorî berjewendiyên xwe biguherînin û nexşeya herêmê bi awayekî nû dîzayn bikin. Herwiha, dixwazin li gorî berjewendiyên xwe dostên nû li herêmê çêbikin, hin rejîman tunebikin, welatan feqîr û bêbandor bikin. Da ku her dem ew xwe hakim û desthilatdarê herêmê, hem li Rojhilata Navîn û hem jî li ser asta cîhanê bihesibînin. Ev rastiyek e ku divê were zanîn, kar û xebat heta niha jî bi vî armancî tê kirin. Li aliyekî, wê rismê ku Îsraîl daye, ew projeya Ebram ya Rojhilata Navîn dîzayn dike. Ev proje ji bo ewlehiya Îsraîlê ye û ji bo ew îslamiyên radîkal, çi Şîa çi Sine ku wan jî qels bikin û baskên wan jêkin. Armanca wê ev e ku Îsraîl di aramiyê de jiyan bike. Hêm jî ev projeyê ji bo aboriya cîhanê, hêm Amerîka û hêm Yekîtiya Ewropa alîyek wê tê de heye, her çendî ew xwe nade diyarkirin jî lê ew alîkare û di nava şer de heye. Ev hemû jî ku rê li ber Sîne û Rûsiya bigirin, da ku wêneyê tê dûzankirin pêk bê.

Niha, li Rojhilata Navîn şer û nakokî hîn berdewam in. Li Sûriyê agir li her derê belav bûye. Li Yemen, şer jî hîn heye. Li Lubnanê hîn nakokî hene. Li Iraqê, li derdorê dewletên cîran şer hîn berdewam e. Ji ber ew jî Îran wê dev ji oldariya xwe bernede û li ber xwe bide, wê xerabiyê jî bike li gorî derfetê xwe yê heyî û vê xerabiyê jî bighîne gelek deveran.

Ev rewşa li Îranê, derfeteke mezin e ji bo gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê. Ev 5 partiyên Kurd dema ku bûn yek û îmze kirin li ser kar û xebatên xwe ji bo pêşeroja gelê Kurd li wê derê, em bihêvînin ku ew jî derfetê têxin destê xwe de û gel rêxistin bikin li ser bingehek ku mafê xwe misoger bikin. Ji ber ku herêm tevlîhev bûye, ew jî derfete, da ku ev bûyerên bi serê Kurdan li parçeyên din rûdan ew jê sûd bigirin. Li gorî min fam kir tekez ew amade ne, ji ber partiyên li wir daketine bajar û gundan parastin dikin, ew gaveke baş e. Lê divê nekevin bin bandora kesên din, ji bo xatirê bi yek reng û yek helwest, kar û xebatên xwe hem leşkerî, hem siyasî, hem diplomatîk bikin, da ku mafê xwe misoger bikin. Ji ber herêm tevlî hev bûye û şertên tên divê bên bikaranîn û têxin xizmeta berjewendiyên gelê xwe, kar û xebat xwe de. Di heman demê de pêwîst e kar û xebatên wan bi awayekî berdewam û berfireh be. Ji ber çalakiyên berê yên Kurdan li wê derê û şehadeta Jina Emînî ew jina Kurd a ku bû mînak ji bo gelê Kurd û cîhanê û şoreşa ku tê çêkirin, gelê Kurd jêre gelek fedekarî kirin û gelek şehîd bûn. Herwiha darvekirina Kurdan rojane li Îranê divê ji bîra me nere.





**Ji bo Kurd li Rojhilatê Kurdistan ji qirkirinê bên parastin erk û berpirsyariya partiyên siyasî yên Kurdî ji bo hevrêziya Kurdî li Rojhilatê Kurdistanê, ji bo demê pêş çi ne û divê gelê Kurd yên çar parça li tevahiya Kurdistanê destekek çawa bide Kurdê Rojhilat?**

Ji gelê Kurd ên her çar parçeyên Kurdistanê û derveyî welat tê xwestin piştgirîya Rojhilatê Kurdistanê bikin, ji ber ku ew jî fedekar bûn li her sê parçeyên Kurdistanê yên din. Ew pir dibûn alîkarî şoreşên çi li Rojava, çi li Başûr, canê xwe dan û gihaştin asta şehadetê ji bo xatirê mafê Kurdan di cîhanê de pêk bê. Em ji bo hemû gelê Kurd dixwazin ku pişta şoreşa Rojhilatê Kurdisatn bikin û hem çalakî li ku derê dibe bila bibe li diyaspora û her çar parçeyên Kurdistan alîkarî bi şoreşa Rojhilat re bê kirin, ji ber ew jî zêdeyî 13 milyon kes li wê derê Kurdên me hene, ew jî dikarin gelek tiştan bidest bixînin û sûda wê li her sê parçeyên Kurdistanê yên din jî hebin, ji ber her parçek rizgar dibe ewqasî hêviya gelê Kurd mezin dibe û dema gelê Kurd dibin yek, dijmin jî hêdî hêdî qelis dibe. Lewra pêwîst e hemû gelê



Kurd piştgirî ji şoreşa Rojhilatê Kurdistan re bikin ku çalakiyan li her derê, diyaspora û her çar parçeyên Kurdistanê lidar bixin. Ji ber ku li Rojhilatê Kurdistanê zêdeyî 13 milyon kes hene, ew dikarin gelek tiştan bidest bixînin û sûda wê li her sê parçeyên din ên Kurdistanê jî bikin.

Îro jî yekîtiya gelê Kurd ji nan û avê girîngtire. Lewra pêwîst e ku kongreya netewî çêbibe û gotina wan yek be, da ku dema li hemû parçeyan astengî derkevin ew bi hev re wan biçûk û lewaz bikin. Divê ew di nav dewletên navnetewî de, cihê mafê mirovan, heq û hiqûqê xwe bidest bixin. Ji ber serdema 21'an, serdema guhertina resim û nexşeyên cîhanê ye, Kurd jî divê maf û serxwebûna xwe bistînin. Tevgera Kurdî îro ne wek 5 an 10 sal berê ye, qonaxek nû dest pê kiriye, tiştê jê bitirsin nemaye, lewma divê tiştekî ji destê xwe nedin û wê derfetê ji bo serxwebûna xwe bikar bîne. Madem ewqas şehîd danîn li hemû parçeyên Kurdistanê, mafê me ye ku welatekî me hebe welatekî demokrat û Kurdistaneke demokrat ku her kes tê de jiyan bike. Ji ber em jî wek hemû cîhanê yên xwedî dîrok, dîroka me ya gelê Kurd jî kevn e. Em mafê xwe li gorî keda şehîdên xwe dixwazin, hem em mafê xwe tim zêde dixwazin û kêm nexwazin. Ji ber ku dema tu mafê xwe kêm dixwazî, dijmin li te dinere ku tu qelsî, ji bo wê dixwaze te bixapîne û mafê te temamî nede. Em bihêvîne bighên mafê xwe. Di heman demê de li gorî rewşa heyî, Bakurê Kurdistanê jî niha derfet heye ku şert û mercên xwe zêde bikin û mafên xwe ji dewleta Tirkiyê misoger bikin. Ji ber ez dibînim dewleta Tirkiyê ji erkê xwe direve û ji bo Kurdan tu mafî nayê dayîn, divê bi hev re doza mafê xwe bikin bi awayekî ku daxwazên Kurdan pêk bên.

# Îran û Israîl… Şerê li dijî sîstemê yan çekên nukleriyê?

Israîl û Amerîka derbeyên mezin li Îranê xistin, şerê wan di navbera parastina çekên nukleriyê û aliyê din têkbirina nukleriyê. Dibe ku sîstem were guhertin û neyê guhertin, lê di nava van geşedan û êrîşan de yekrêziya gelê Kurd dibe kelehek li hemberî hemû sînaryoyên muhtemel.

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

**Pêvajoya Îran û êrîşan mîna pêvajoya Sûriyê ye… berjewendî berî hertiştî ne**

Serokwezîrê Îsraîlê Benyamîn Netanyahu ragihand ku wan bi Amerîkayê re dest bi operasyoneke leşkerî ya hevbeş a li dijî Îranê di 28 Sibatê de kiriye. Netanyahu diyar kir ku armanca van êrîşan bidawîanîna “gefa” desthilata Îranê ye. Herwiha da zanîn ku ew dixwazin derfetekê bidin pêkhateyên Îranê da ku çarenivîsa xwe diyar bikin. Serokezîriya Îsraîlê îro gotareke Netanyahu belav kir. Ev aramca sereser ye, armanca di bin maseyeyê de ne wiha ye. Em bînin bîra xwe pêvajoya ku Sûriyê tê re derbas bû û hîna berdewam e tekez dike ku sîstema rêjîma Baas nehat guhertin, mafê pêkhateyan û azadiya wan nehat bidestxistin. Netanyahu li gel ragihandina destpêkirina êrîşê, spasiya Serokê Amerîkayê Donald Trump kir. Netanyahu ji bo rola Trump a di vê operasyona bi navê “Lion’s Roar” (Nirîna Şêr) de got, “Serkirdayetiya dîrokî.” Çendîn Israîl û Amerîka bêjin armanc têkbirina rêjîma Milayî ya Îranê be, lê armanca wan xweş diyar e ku ew e têkbirina sîstema nukleriyê ye, ango armanca wan ne xelasiya gelê bindest ji sîstema Milayî ya Îranê ye, lê belê berdewambûna hebûna Israîl û Amerîka ye.

**Şerê li dijî nukleriyê Ev e aramanc**

Netanyahu diyar kir ku ev gav ji bo rêlibergirtina çekdarbûna bi çeka nukleerî ya Tehranê ye. Serokwezîrê Îsraîlê di gotar xwe de got, “Bi dehan sal in berpirsên Îranê dirûşmên ‘Mirin ji bo Îsraîlê û mirin ji bo Amerîkayê’ dibêjin. Xwîna me rijandine, gelek Amerîkî kuştine û gelê xwe jî komkujiyê re derbas kiriye.” Ji ber vê yekê me êrîşeke hevbeş ya Israîl û Amerîkayê li ser Îran pêk anî. Aramca êrîşan berdewambûna Israîl û hebûna Amerîka li herêmê ji bo pêkanîna Rojhilata Navîn a ku wê bibe qadeke fereh ji projeyên aborî, di heman demê de da ku




tirsa Israîl ji çekê nukleriyê nemîne.

**Peyama ji bo Kurd û gelên din… dibe ku lîstokeke**

Serokwezîrê Îsraîlê peyamek arasteyî pêkhateyên Îranê kir û got: “Ji bo hemû pêkhateyên gelê Îranê; Fars, Kurd, Azerî, Belûç û Ehwaziyan dem hatiye ku zincîrên zordariyê bavêjin û azadî û nirxên aştiyane bînin Îranê. 47 sal in rejîma ayetulayan dirûşmên ‘Mirin ji bo Îsraîlê’ û ‘Mirin ji bo Amerîkayê’ dibêjin. Wan xwîna me rijandiye, gelek Amerîkî kuştine û gelê xwe jî komkuj kiriye. Qedexe ye ku ev rejîma terorîst û kujer xwe bi çekên nukleerî biçek bike ku rê bide wê gefê li hemû mirovahiyê bixwe. Operasyona me ya hevbeş dê rewşekê ji bo gelê wêrek ê Îranê biafirîne da ku çarenûsa xwe bigirin destê xwe. Ji bo hemû pêkhateyên gelê Îranê; Fars, Kurd, Azerî, Belûç û Ehwaziyan dem hatiye ku zincîrên zordariyê bavêjin û azadî û nirxên aştiyane bînin Îranê.” Dibe ku ev name ji bo pêkhateyên li Îran û Rojhilatê Kurdistanê dijîn lîstokek be, ji ber ku Amerîka bi nêht e ku rêjîma Îran a kevin hilîne û rêjîmeke din a desthilatdar li gor xwe ava bike. Nimûneya vê siyasetê li Sûriyê pêkhat, Tramp Colanî ji şikeftên terorê derxist, kincên siyasetê ji bo berjewendiyên xwe lê kirin. Piştî ku Colanî hat ser desthilatdarê êdî heman siyaseta Elesed da meşandin. Wekî tê zanîn ku gava duyemîn a guhertina Rojhilata Navîn, ji Sûriyê piştre jî vaye li Îranê pêktê, Îran rastî rûxandinê di warê çekê nukleriyê de tê û derbasî qonaxeke nû dibe. Ne xerîb e ku em desthilateke nû Îranê bibînin, desthilateke ku li gorî Amerîka û Israîlê be. Lê ya girîng ew e ku ew ê mîna lîstoka li ser gelên Sûriyê hatiye lîstin, li ser gelên Îran jî were lîstin an na.

**Erdogan metirsîdar û dilgiran e!**

Serokkomarê Tirkiyeyê Recep Tayyîp Erdogan li ser êrîşa hevpar a Amerîka û Îsraîlê ya li ser Îranê axivî. Erdogan got, “Dema em wekî Tirkiyeyê hewl didin ku di van rojên pîroz de li herêma me û cîhana Îslamê aştî û aramî serdest be, em ji ber êrîşên Amerîka û Îsraîlê yên bi provokasyonên (Benjamin) Netanyahu gelekî dilgiran in.” Belê ev bûn gotinên Erdogan, Tirkiyê û hikumeta wê bi partiyên AKP û MHP’ê ji ber rewşa êrîşên li ser Îranê di kaosekê de jiyan dikin. Her kes dizane ku Tirkiyê ji vê pêvajoyê û guhertina sîstemên ku dibin asteng di pilanên Israîl û Amerîka de, ew neçar e ku xwe weke hêzeke Îslamî li dijî Israîlê derxe pêş û bêje tu xeter e li ser min. Tirkiyê di nava du dîwaran de maye û nizane pişta xwe bide kîjan dîwarî, dîwarek ew e ku pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk e, bi riya wê divê mafê gelê Kurd di nava welatekî demokrat de bide Kurdan. Dîwarê din jî amadekariyên ji bo êrişên muhtemel li ser Tirkiyê yên ku dibe piştî Îran li ser Tirkiyê jî ji hêla Israîlê ve bên kirin.

**Îranê baregehên Amerîkayê yên li herêmê hedef girtin… Veguherandina ber bi tevlîheviyê ve**

Aramanca her du aliyên êrîşkar ew e ku herêm ber bi şer û tevlîheviyeke mezin ve biçe. Artêşa Îranê ragihand ku wan di bersiva êrîşên Amerîka û Îsraîlê de, bi dehan mûşekên balîstîk û dronan êrîşî Îsraîlê kiriye. Îranê bi êrişên mûşekî bi awayekî hevwext baregehên Amerîkayê yên li welatên wekî Behreyn, Mîrgehên Ereb ên Yekbûyî (Îmarat), Kuweyt, Qeter û Urdinê hedef girtin. Ev yek li ber çavan e ku dê alîgirên Îranê bêbersiv nemînin û êrişî bargehên Amerîkî li her derê bikin, li Hewlêr, li Îmarat, Behrên û hemû welatên ku me li jorê anîn ziman. Ev yek komployeke û li ser gelê herêmê tê meşandin, ê ku bedel jî dide civak û mirov e, em di rewşeke wiha de ne ku mirov hîs dike şerê cîhanê yê siyemîn bi piratîkî û bi rengekî hêzdarî dest pê dike. Artêşa Îranê ragihand ku wan di bersiva êrişên Amerîka û Îsraîlê de, bi dehan mûşekên balîstîk û dronan êrîşî Îsraîlê kiriye. Îranê bi êrişên mûşekî bi awayekî hevwext baregehên Amerîkayê yên li welatên wekî Behreyn, Mîrgehên Ereb ên Yekbûyî (Îmarat), Kuweyt, Qeter û Urdinê hedef girtin. Hat ragihandin ku baregeha deryayî ya Amerîkayê ya li Behreynê jî bûye armanca êrişan.

**Divê Kurdê Rojhilatê Kurdistanê êdî çi bikin?**

Ji ber ku Îran di qonaxa guhertinê de ye û dibe ku sînaryoya Sûriyê li Îranê jî pêkwere, ango sîstemeke li gorî Amerîka were sazkirin. Lewma jî divê gelê Kurd di warê siyasî, leşkerî û hwd… de amadekariyên xwe bikin, dibe ku sîstemeke federal li Îranê ava bibe, dewletên hegemon tu carî serwebûna Kurdistanê naxwazin, lewma jî divê gelê Kurd li gorî sîwan û pilana ku hatiye sazkirin tevbigerin. Di serî de yekrêziya Kurdî û yekhelwestiya Kurdan û partiyên siyasî tiştekî herî girîng, Rêber Apo di bangên xwe de jî bal kişandiye ser hevrêziya Kurdî, di heman demê de tekez kiriye ku Rojhilata Navîn wê rastî guhertineke mezin û xeternak were, eger yekhelwestiya Kurdan lawaz be ew ê gelê Kurd rastî qirkirinê werin. Dema ku gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê yek be û xwedî dozeke istratejîk be ew ê ji qirkinê xelas bibe, pilan çi bin, sîstema Îran û Rojhilata çawa be yekrêzî ew ê bibe dîwarek li hemberî êrişên qirkirinê.



## Şerê Îranê… pêşbirka hegemoniya sedsalê ye!

**Dilyar Cizîrî**

Êrişa Îsraîl Amerîka ya li dijî Îranê dê bibe destpêka guhertineke nû li tevahî Rojhilata Navîn û Cîhanê, her çendî Çîn, Rûsiya fermî ne ketine şer, lê ew tê dene û vî şerî wekî şerê xwe dibînin. Çîn û piraniya parzemîna Asya bi girtina Riya Hirmiz re bi bandor bûne. Bi taybet ji ber Çîn piraniya sotemanî û gaza xwezayî di wê riyê re peyda dike. Li aliyê din heger şerê Îranê dirêj bike, tê wateya pirsgirêka xaza xwezayê li tevahî welatên Ewropa hîn jî kûrtir bibe. Niha jî ev pirsgirêk bi dijwarî destpêkiriye. Yenî ev şer yekser Yekîtiya Ewropa jî eleqedar dike.

Ji ber wê şerê niha li Rojhilata Navîn diqewime ji leşkerî zêdetir şerekî aborî û siyasî ye. Mirov dikare navê gavên rêgirtina Rûsiya û Çînê lê bike. Ji bo Îsraîlê jî ev şerê girtina serkêşiya Rojhilata Navîn e û rêveberiya wê ye. Ji ber wê jî Îsraîl di rojên destpêkê de Xameneyî û gelek fermandarên Îranê tasfiye kir û xwest bêje ez dikarim her tiştî bikim. Ev peyam ne tenê ji Îran û dijminan re ye, di heman demê de ji dost û alîgiran re. Îsraîl û Amerîka bi vê yekê ji tevahî welatên Rojhilata Navîn re dibêjin, an hûnê di xeta min de bimeşin, an jî hûnê tune bibin.

Bersiva Îran û berfirehkirina şer li welatên Rojhilata Navîn riya tekoşîna man û nemanê ye. Ew tiştekî normal e. Îran hêvî dike bi dirjkirina aloziyê re hêza dijberan were xerckirin. Di heman demê de aloziyan kûrtir bike, da alîgirên wê yekser bikevin navenda vî şerî. Texmîna min ew pêk nayê. Ne Çîn û ne jî Rûsiya dê xwe bikin navenda şer.

Li aliyê din jî Amerîka û Îsraîlê bi vî şerî dixwazin hegemoniya xwe ya sed salê mayînde bijin. Bi wate şerê niha li Rojhilata Navîn şerê hegemoniya cîhanê yê. Rûsiya û Çîn bêyî bi xwe bikevin navê dê hewl bidin Îran biparêzin û şer dirêj bikin.

Di gera xwe ya di nava nûçeyan de me dît hin lêkolîner dibêjin Îran bi firehkirina şer denge daye guhertin, nerîna min Amerîka û Îsraîlê jî dizanin şerê wan li dijî Îranê fireh bibe. Di heman demê de wan texmîn dikir şer hinekî dirêj bibe. Serokê Amerîka Tramp got şer wê çend hefteyan dewam bike. Di nerîna min de berfirehkirin û dirêjkirina şer ji berjewendiya Îsraîl û Amerîka ye. Wiha zextê li ser welatên derdorê dike, Yekîtiya Ewrûpa, welatên ereb ên Kendavê û her wekî din. Peyama metirsiya rewşê nîşanî wan dide. Her metirsî zêdetir û dirêjtir bibe, dê ew welat zêdetir bikievn bin banê Amerîka û Îsraîlê.

Amerîka û Îsraîlê jî baş dizanin bi vî rêbazê şer dê nikaribin rêjîma Îranê hilweşînin. Li gorî plana wan a gava duyemîn civakê li dijî rêjîma Îranê rakin ser piyan. Ji ber gelê kurd civak jî dijberê rêjîmê ya herî rêxistinkirî ye. Di rojên pêş de dê çavê tevahî cîhanê li ser Rojhilatê Kurdistanê be. Gelê kurd li Rojhilat divê baş gavên xwe bavêje û baş bi rêxistin bikin.



# ‘Hêviyên me yên vegera Efrînê wê her zindî bimînin’

Dayikên koçber yên Efrînê diyar kirin ku bi hatine meha Remezanê ji ber şert û mercên koçberiyê zehmetiyan dikşînin û gotin, “Tevî hemû zehmetiyan jî, em di nav her rojekê de sed car hêviya vegera Efrîn dikin, ji bo vegera Efrinê hêviyên me wê her tim zindî bimînin."

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Di nava her salekê de mehek taybet heye, ew meh jî meha Remezanê ye ku her kes di wê mehê de rojî digre û xwarinên xwe yên kevneşop didin çêkirin. Lê belê di van salên dawî de ji sedemên şer û ne ewlehiyê, li Bakur û Rojhilatê Sûriyê û li tevahî Sûriyê gelek bi hezaran malbat rastî koçberiyê hatin. Her wiha ev 8 sal in ku bi hezaran welatiyên Efrînê derveyî mal û warê xwe meha rojiyê bi awayekî zehmet derbas dikin. Ev 8 salin ku her roj bo benda vegera Efrînê ne. lê her sal careke din rastî êriş û koçberiyê tên. Di vê çarçoveyê de dayikên koçberên Efrînê ku niha li dibistanan de niştecih bûne, ji Rojnameya me re axivin.

**Koçberî û meha Remezanê**

Ayde Reşîd a ji bajarê Efrînê ye ku 5 carin ew koçber dibe, niha jî ew li dibistanek ji dibistanên bajarê Qamişlo niştecih bûye, Wiha behsa rewşa koçberiyê û hatina miha Remezanê kir: “Em û malbatên xwe pir zehmetiyan dikşînin, ji ber ku her cara em koçber dibûn, me mal ji xwe re ava dikir, mixabin em car din rastî koçberiyê dihatin. Niha jî em li bajarê Qamişlo ne û di dibistanan de bi cih bûne, rastî di dema destpêka ku em koçber bûn pir alîkarî ji bo me hatin pêşkêş kirin lê ev demek bû, ev alîkarî ne bi awayekê berdewam bû, niha em bê alîkarî mane. Wek tê zanîn ku em di miha Remezanê de ne û em bi rojî ne û pir zehmetiyan di vê mehê de dikşînin. Zarokên me birçî dimînin ji ber ku em betalin û karê me hatiya rawistandin. Em di vê pêvajoyê de tenê li bendê ne ku vegerin warê xwe û êdî ji van zehmetiyan xilas bibin.”

‘Hêviya me ya vegera li Efrînê roj bi ro mezintir dibe’

Ayde Reşîd di dawiya axaftina xwe de wiha got: “Ji bo Dezgeha Xêrxwaziya Berzanî ku 2 caran hat dibistana ku em lê bi cih bûne û ji me re alîkarî pêşkêş kirin, lê ew alîkariyên ku hatin pêşkêşkirin jî ji bo me ne têrker bû. Ji ber em 44 malbat di vê dibistanê jiyan dikin û ev malbat xwedî zarokên biçûk in, em dixwazin ku alîkarî ji me re werin kirin, da ku em karibin di vê meha Remezanê de debara jiyan xwe bidin meşandin. Di dawî de ez dixwazim bêjim ku hêviya me a vegera li Efrîn pir mezine û ti car bila dijmin nefikire ku ew îradeya me dişkîne. Ji ber îradeya gelê Kurd nayê şikandin û her roj hêviya me ji bo avakirina Kurdistanek yek parçe mezintir dibe.”

**‘Heviya me ya vegerêra Efrinê her zindiye’**

Di heman mijarê de Semîra Reşo jî diyar kir ku ew bi hatina meha Remezanê pir kêfxweş in, lê li kêleka wê ew pir zehmetiyên jiyanî dibînin û wiha pêde çû: “Em niha li bajarê Qamişlo ne, Rastî ji bo hatina meha Remezanê em kêfxweş in di heman demê de em pir xemgîn in ku em her car ji warê xwe koçber dibin.



**Ayde Reşîd**



**Semîra Reşo**

Rûxmî ku em pir zehmetiyan dikşînin û bê mal mane lê dîsa jî em di nav her rojekê de sed car hêviya vegera Efrîn dikin. Tu car Efrîn di dilê me de namire her em ê têkoşîn bikin. da ku vegerin Efrîn.”

**‘Em ê wan rojên xweş car din jiyan bikin’**

Semîra Reşo da zanîn ku ew ê heya dawî berxwe bidin, da ku encama vê berxwedaniyê vegere Efrîn be û wiha domand: “Dema em li Efrîn bûn û meha Remezanê dihat, me bi hemû coş û moral Remezan pêşwazî dikir, Her wiha me bi hev re xwarinên xweş yên kevneşopiyên Kurdan çêdikir. Rastî jî ew rojên pir xweş bûn û hêviya me pir mezine ku em car din vegerin cih û warê xwe û em wan rojên xweş car din jiyan bikin.”

**‘Em zêdeyî 3 caran koçber bûne’**

Semîra Reşo di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: “Piştî koçberiyê jî em çûn Şehbayê me li wir xwe bi cih kir û me ew erda zuha veguherand erdek kesk, tijî kulîlk û heya astekî rewşa me baş bû, lê dijmin bi vê yekê kêfxweş nebû û bi êrişek hovane em ji Şehba koçber kirin. Em çûn kantona Firatê ya ku Rêveberiya Xweser ewlehiya wê dikir, heya me li wir jî hinek xwe bi cih kir, car din em koçber bûn niha jî em li bajarê Qamişlo ne, di dibistanan de jiyan dikin. Dibistan cihê xwendinî ye, ne cihekî ku mirov tê de jiyan bikin. zehmetî û astengî pirin. Em zêdeyî 3 caran koçber bûne. Em bi hêvî ne ku vê carê em koçberî ti cihan nebin, em dixwazin vegerin Efrîna xwe, ji ber em ji koçberiyê westiyan.”

**‘Spasî ji bo Rêveberiya Xweser û Dezgiha Xêrxwaziya Berzanî’**

Semîra Reşo got ku: “Em her li pişta hêza xwe ne û ti car jî em ê bê hêz nemînin. Ez dixwazim spasiya Rêveberiya Xweser û kesên ku alikaî şandiye dikin ku bi hemû hêza xwe alîkariya me kirin, lê ji bo ku em vê meha remezanê bi rehetî xilas bikin. Pêwîstiya me bi hin alîkariyên mîna mazot av û xwarin heye.”

# ‘Divê zarok bi zaroktiya xwe jiyan bike’

**Solîn Mihemed/ Qamişlo**

**Berdevka Rêxistina Stêrk ya Şopandin û Parastina Mafê Zarokan Jûliya Xelo da diyarkirin ku di dorpêça Kobanê de zarok ji mafê xwe yê zaroktiyê hatiye dûrxistin û got, ‘Divê zarok bi zaroktiya xwe jiyan bike.”**

Zarokên di nav şer û dorpêçê de, rûbirûyê şert û mercên pir dijwar dibin. Ev zarok bi tirs, kêmasiya xwarin û dermanan, û qutbûna ji perwerdahiyê re dijîn. Zarokên di bin dorpêça li bajarê Kobanê de Jiyana wan di bin xetereyeke mezin de ye û pêşeroja wan bi giranî bandor dibe.

Di derbarê mijarê de berdevka rêxistina Stêrk ya şopandin û parastina mafê zarokan Jûliya Xelo ji Rojnameya me re axivî.

**‘Her tim zarok dibin qurbaniyên şer’**

Jûliya di destpêka axaftina de bal kişand li ser rewşa zarokên di bin şer û dorpêçê de û wiha got:” Weke ku em dizanin şerekî pir giran li ser herêman têne meşandin. Bi tayîbet şerên leşkerî,



piskilojîk û derûnî li ser zarokên me tên e meşandin. Ev dorpêçkirina li ser Kobanê demeke dirêj e ku didome. Di vî alî de bandoreke pir mezin li ser rewşa zarokan dike. Ji xwe weke ku em dizanin her tim zarok dibin qurbaniyên şer. Ji bo wê jî di vê dorpêçkirina Kobanê de qurbaniyên herî mezin zarokin. Ji ber ku îro roj em dibînin ku zarok ji mafê xwe yê zarokatiyê dûr ketiye. Herwiha ev zarok ji xwarinê, tedawiyê, perwerdeyê û tiştên jiyanî dûr ketine.”

**‘Zarok di dorpêça li ser kobanê de ji tedawiyê qût bûne’**

Jûliya anî ziman ku îro zarok di dorpêça kobanê de ji tedawiyê qût bûne û wiha domand:” Ji ber derengmayîna dorpêçê li ser Kobanê derman tune bûne ku zarok ji ber rewşa xwe ya tenduristî werin tedawîkirin. Zarok di ewqas serma û zehmetiyên rewşa hewayê de derbas bûn. Ji ber sermaya zêde û nepeyîdakirina pêdiviyên zivistanê li beramberî çavên her kesî pênc zarokên ku nû çavên xwe li duniyayê vekiribûn jiyana xwe ji dest dan. Em wek rêxistina Stêrk vê rewşa li Kobanê pir zehmet didin nirxandin ku îro roj gelê me yê Kurd di rewşeke aloz de jiyan dike.

**Bandora şer li ser zarokan**

Jûliya da xuyakirin ku bandora şer li ser zarokan hem piskilojî ye û hem jî derûnî ye û wiha berdewam kir:”Bandora şerê ku li ser zarokan tê kirin hem ji aliyê piskilojîk e hem jî ji aliyê derûnî ve ye. Dema zarok kesekî ji malbata xwe winda dike zehmetiyeke pir giran li piskilojiya wî dike. Ya din jî dema ku zarok di şeran de parçeyek ji laşê xwe winda dike ev jî pir bandorê li ser jiyana wî ya derûnî dike. Dema ku di nav hevaline xwe de dest yan jî lingê wî tune be ew bandoreke pir mezin pêre dide avakirin. Ji ber dema ku zarok di zarokatiya xwe de bi kêmasiyekê jiyan dike dema mezin dibe jî ew pêre weke piskilojiyekê dimîne. Ji ber vê jî rewşên zarokan di şeran de ji aliyê piskilojîk û derûnî de pir zehmetin.”

**Daxwaz û hêviyên rêxistina Stêrk**

Jûliya Xelo di dawiya axaftina xwe de bal kişand li ser zehmetiyên Kobanê û wiha bidawî kir:” Wek rêxistina Stêrk ji ber ku em rewşê hemûyî dişpînin em dixwazin çareseriyê ji hemû êş û zehmetiyên xelkên Kobanê re bibînin. Lê weke ku her kes dizane ewqas çalakî hatin lidarxistin, ewqas mesac hatin şandin û herwiha agahî û bûyerên ku li ser ragihandinê derketin hatin temaşekirin, da ku îro vê dorpêçê li ser gelê Kobanê bidin rakirin. Em dibînin ku Kobanê ber bi xeteriyeke pir mezin ve diçe. Ji bo wê jî me wek rêxistina Stêrk gelek çalakî ji bo gelê me yê Kobanê lidar xistin. Em bihêvîn e ku îro roj ev lihevkirin bêne kirin, da ku rewş aram bibe û dorpêça li ser bajarê Kobanê were rakirin.

**Bîra Civakê**



## Civaka Îranê rûberûyî guhertinên stratejîk e

**Ehmed Hesen**

Ji şoreşa Îslamî ya Îranê ya sala 1979’an û vir ve sîstema Îranê ji dewleteke xwedî sîstema şahîtiyê ber bi Komara Îslamî ve hat guhertin, ev guhertin bi serkêşiya Eyetullah El Xumeynî û piştigiriya hin tevgerên çepgir û Îslamî pêk hat, mirov çendîn behsa guhertina sîsteman bike jî, lê di encamê de ya ku bandora xwe li ser civaka Îranê dimeşîne, sîstema serwer a Îranê ye. Îran welatekî di nava xwe de pirçandî û pir netewbûnê civakî dihewîne, taybet Ezerî, Pers, kurd, lor, beloş, Ereb û Turkmen jî têde hene, lewra jî erdnîgariya wê xwedî bandoreke mezin e, lê ji şoreşa Îslamî û vir ve ev pêkhate rastî qirkirina çandî, zimanî û fîzîkî tên, sîstema Îranê hemû beşên civakî di nava hemleyên xwe de dane tepeserkirin û çewisandineke mezin li dijî nirxên civakan pêk tên, nexasim di aliyê çewisandina mafên jinan û qetilkirina wan de roleke berbiçav a Îranê tê dîtin, taybet di sala 2025’an de zêdetirî (203) rewşên kuştina jinan hatine belgekirin, di heman demê de ji bilî vê yekê civaka Îranê di nava krîzeke aborî ya giran de jiyan dike. Di roja îro de ji ber sedemên ku min bi bîr xistine şoreşek bi pêşengtiya jinê tê meşandin, taybet civaka Îranê êdî di wê ferqê de ye sîstema Tehranê nikare ji pirsgirêkên civakê re bibe destek û çareserî, lewra jî hem di aliyê leşkerî de û hem jî di aliyê siyasî de pêwsîtiya Îranê bi guhertineke mezin dibînin, lewra jî nerazîbûnên mezin di nava Îranê de li dijî sîstemê ji aliyê civakê ve derdikevin.

Ya rast bi guhertina sîstema Îranê re, wê li Rojhilata Navîn gelek guhertinên berbiçav rûbidin, di nav de jî tevgerên ku Îranê ew destek dikirin di serî de Huzbillah, Hemas û Hûsî wê bandora xwe ji dest bidin û pêvajoyeke nû bê destpêkirin. Taybet ji bo civaka kurd derfeteke mezin e ku bikaribin di vê rewşa kaotîk de karibin hêza xwe komî ser hev du bikin û îradeya xwe biparêzin, weke çawa li Rojava bûn xwedî xeta xweparastina herêmên xwe, li wir jî dikarin bi heman şêweyan parastina xwe bikin, ji ber ku wê sîstema Îranî tu carî ji bo parastina civaka kurd di Îranê de gavan neavêje, berovajî vê yekê wê gef û êrîşên tûndiyê li dijî wan xurtir bike. Ji bo gelên dîtir jî bi heman rengî ye, da ku karibin hebûna xwe ji bin serweriya tûndiya rêjîma Îranê biparêzin, ev dem wê derfetê dide ku hevgirtin û hevpeymana pêkhate û civakan xurtir bibe û li dijî zilma sîstemê bibe xwedî helwest. Di heman demê de rê nedin hesabên hêzên hegemonîk ku li ser hesabê qirkirina kurdan careke din berjewendiyên xwe biparêzin û wan bi qirkirinê re rû be rû bihêle. Ji xwe dîroka Îranê bi rêbazên xapandin û sabotekirinê dagirtî ye, ji Qazî Mihemed Bigire heta roja îro her gav ev xeta dijberiya gelê kurd dewam dike, lewra jî di demeke wiha de civaka kurd li Rojhilatê Kurdistanê dikare bi awayekî sîstematîk li dijî vê rêjîma kujer îradeya xwe biparêze, ev îrade dikare di siberojeke nêz de hebûna xwe bide îspatkirin û bi gelên Îranê re bikevin nava têkiliyên dîrokî.